
kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

# bîrnebûn

hejmar 59 | 2014



www.arsivakurdi.org

# MIZGÎNÎ BO ZAROKAN!


## Kitêbeka nû bi herdu dialektên kurdî; kirmanckî û kurmancî di wê payîzê de derdikeve.

**Kirmanckî**

Sven Nordqvist

*Ma ti Dat Mendo û Findoyî nas kena?*

Mîyanê hêga û mergan de çewlîgêko hurdî esto. Mendoyo kal bi pisîngê xo Findoyî uca de ciwîyênî. Rojê kayêk yeno Findoyî vîr. O hin çîyan nimneno û ganî Dat Mendo zî înan bivîno. Dat Mendoyî rê zehmet o la Findo û kergî do hetkarîya ey bikîn.




**Kurmancî**

Sven Nordqvist

*Ma tu Mam Mendo û Findo nas dikî?*

Li nav zevî û mêrgan çewlîgeke biçûk heye. Mendoyê kalemêr bi pisîkê xwe Findo ve li wir dijîn. Rojekê lîstikek tê bîra Findo. Ew hin tiştan vedişêre û divê Mam Mendo jî wan bibîne. Ji bo Mam Mendo zehmet e, lê Findo û mirîşk ê alîkarîya wî bikin.




www.arsivakurd.org




7
Li Baselê panêla Bîrnebûnê



10
Helbijartinên şaredariyan



18
Jinên ji kurdên Anatoliya Navîn li Muzexaneya Etnografi ya li Stockholmê



**Xizmeta tercûmanî ya Kurdî bi telefonê**

**Tercuman berpirsiyarê sirveşartineye**

39
Xizmetên wergerê li Swêdê
Tecrûbeya kurdî
(1973-2013)

www.arsivakurd.org

# bîrnebûn

ISSN 1402–7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.
**Utges av Apec Förlag AB**
hejmar 59 | 2014
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

**Koma redaksiyonê**
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen, M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran, Mem Xelîkan, Mustafa Mıh, Özgür Kara û Yusuf Polat

**Adress**
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046–(0)8–761 24 90

**E–post**
info@birnebun.com

**Internet:**
www.birnebun.com / www.birnebun.eu

**Têkilî/İlişki**
Danimarka: Irfan Baysal, 0045–27 11 58 83

**Belavkirin / Dağıtım**
Ewrupa:
Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049–172 298 24 51

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 5 TL

**Abone**
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgiro: 402–2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro–Stockholm/Sweden
**BIC/SWIFT: DABASESX**
IBAN: **SE23 1200 0000 0123 5020 6874**
Çap / Baskı: Apec–Tryck AB




Ji gundê Omera; Besa Hecî Mistefê, Zexa Heco, Eyşa Dewrêş liber Tevnê -Fittja 2014

Wêneyê berg: Girtiyên hepsa Elbîstanê yên siyasî
Arşîv: Doğan Durukan (Danîmarka)

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

# Naverok


Ji Bîrnebûnê 6
**Alî Çiftçî**

Li Baselê panêla Bîrnebûnê 7
**Yücel Atici**

Helbijartinên şaredariyan 10
**Muzaffer Özgür**

BDP-HDP ve İç Anadolu Kürtleri 14
**Fatin Kanat**

Cihanbeyli ve Kulu Belediye Seçimleri 12
**Ahmed Gezer**

Pêşengeha xaliyên bi dest çêkîrî 18
**Altun Başaran**

Wêne 22
**Seyfi Doğan**

Zûgotinok-II 26
**Mem Xelîkan**

Helbest: Jiyan xweş e 27
**Mem Xalîkan**

Helbest: Baran dibarî 27
**Mûlla Evîndar**

Çîkolata 28
**Nesrin Bayram**

29 Pekenok
**Mûlla Evîndar**

30 Li ser qirkirina Dêrsîmê
**Konseya Rêvebir ya KNKê**

31 Tofan
**Bertolt Brecht**

34 Sîyarê Têrika-II
**Dr. Mikaîlî**

39 Tecrûbeya kurdî (1973-2013)
**Rohat Alakom**

57 Sohbetên Mamê (3)
**Mama Recall**

60 Helbest: Nizanim Çima
**Xizan Şîlan**

61 Gul û kulîlk
**A. Karabax**

62 Cehzû
**Seyfi Doğan**

66 Şikari Metinleri
**Sedat Ulugana**

69 Germiyan Beyliği
**Yılmaz İzmirlier**

74 Nirxandin
**Sêfoyê Asê**


www.arsivakurdi.org

# Ji bîrnebûnê

**Nakokiyên li Rojhilata Navîn dê nexşeya herêmê biguhire**

Berî bi sed salî sînorên Rojhilata Navîn, piştî ku dewleta Osmanî hilweşiya ji aliyê dewletên Europa yên dagirker ve, bi bendekî hatibûn kişandin bê ku meselên netewî û olî bidin berçawan!

Bi hevdîtînên dizî, li Paris û Londonê, Fransa û Îngîlîstanê biryar dan ku Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrika, di nav hev de parve bikin. Hîmdarên vê peymanê fransîyekî bi navê François Georges-Pico û yê din jî îngîlîzê bi navê Mark Sykes e.

Piştî vê peymanê cara duyêm axa Kurdîstanê hatibû parve kirin. Li Rojhilata Navîn Irak, Suriye, Tirkiye û li bakûrê Afrikayê jî gelek welatên wek Libyayê avabûn. Li hemû van welatan pirsgirkên netewî, kêmnetew û oli yên ku hebûn wek kapaxekê bidin ser qasikekê, weşartî mabûn. Îro ku ev dewletên ne bi xwezayiya xwe, ji ber berjewendiya dewletên dagirker ve hatibûn avakirin, yek li du yekî ku hildiweşin, bixwaze an nexwaz ew pirsgirekên ku bi salan veşartî mabû derdikevin holê.

Lîbye, Suriye û Iraq dê wek dewlet di rojên pêş de li ser nexşeya dunê nemînin. Di şûna Lîbyê de dewletên wek "Tripolîstan", "Fezzan", "Cyrenika" û li Suriye û Iraqê jî dê "Şîhistan", "Sunîstan/Cîhadistan", "Elewistan" û Kurdistan bên avakirin.

Îro rewşa me kurdan ne wek ya 100 salî ber vê ye! Kurd li herçar aliyên Kurdîstanê bi rêxistin in. Li Başûr ev zêdeyê 11 sal in wek fermî di nav Dewleta Federal a Iraqê de îdare xwe bi xwe dikin. Li Rojava ev sê sal bû li ber xwe didin, erdê xwe diparêzin û bi rêxistin in. Li Bakûr jî gelek derfet bidest xistine. Li hemû bajarên kurdan nebe jî li piraniya bajaran rêvebirina şaredariyan di destê kurdan da ye.

Dema em wan giştikan bidin ber çavan rewşa kurdan a îro li gor sed salî pir pir pêşda ye. Hêdî ji bo Başûr wexta serxwebûnê hatiye û derbas jî bûye!

Danûstendin, hewkarî û li hember hev bi tolerans bûyîn me ber bi Kurdistaneke serbixwe ve dibe!

Hêviya me li hemû berpirsên sîyasî, kesayetî, reweşenbîr û bi taybetî jî ji medya kurd ev e; ev rewşa nû ya ku rûdaye baş binirxînin û bi berpirsiyarî tevbigerin. Em xwe ji gotinên neyartiyê bi dûr bixin.

**Serxwebûn û xwedî dewletbûn çawa ji bo xelkên din mafekî pir xwezayî ye ji bo kurdan jî hewqes xwazayî ye!**

Heta roja îro ti neteweyekê dest ji dewletbûn û serxwebûna xwe bernedaye. Heta ku ji wan tê dewletên xwe xurt dikin û bi pêş ve dibin. Herku diçe dewletên nû ava dibin.

Tenê bi rêya dewletbûn û serxwebûnê mercên ku wek netew, aborî, nasname, ziman, çand û hebûna xwe bi pêş ve bibî û refahê bo xelkê xwe bi cî bikî, çêdibe!..

*Alî Çiftçi*



www.arsivakurdi.org

# Li Baselê panêla Bîrnebûnê

Yücel Atici

Yekemcar beşdarî panelekê dibim ku ji destpêkê heta dawiyê bi kurdî bû. Malbatên kurd bi zarok û ciwanên xwe ve beşdarî civînê bûn.

Di dawiya civînê de civaka beşdar, ku nêzikî sed kes bûn, bi pirs û rexneyên xwe eleqeyeke gelek mezin nîşan dan.

Hevalên kovara Bîrnebûnê di civînê de qet li ser xebatên xwe nepeyîvîn. Xuyabû ku wan xwe bi zanebûn xistibûn bin sîya pirsgirekên kurdên dervayî welêt.

Gotardêrê yekem birêz Apo Koyuncu bû. Apo li Xelikê jêr hatiye dinê û li Baselê mezin bûye. Li zanîngeha Basel û Zurîxê hiquq û aborîzanî xelas kiriye. Di dema xwendevaniya xwe de di rêxistina “Kurdische Studentenverbindung” cîh girtiye. Bi rêxistina Xwendevanên Kurd li Basel û Zurîxê, bi dehan xwendevanên kurd zimanê xwe pêşda birin. Apo jî yek ji wan e.

Apo di gotara xwe de nişan da ku kurdên ji nifşên yekem ne tenê ji bo ziman zehmetiyeke mezin kişandi-



www.arsivakurdi.org



bîrnebûn | 7

ne. Astengiya herî mezin biyanîbûna kultura Swîsrê ye. Û xwe bi nasnamê xwe îfade kirin bû. Çand ne tenê bi xwarin û vexwarinê sînor kir. Çanda ku Apo li ser veda, li saziyên dewletekê û olî heta saziyên civakî yek bi yek û bi mînak biyanîmayîna kurdên ji nifşên yekem anî ser ziman. Li vir nikarim hemû gotûbêjan rêz bikim. Lê dixwazim ji we re çend dendikên balkêş parve bikim.

Di rû bi rûyên cûdahiyên çandê de anî ber çavan, ku kurdên ji nifşên yekem ji ber xezayiya biyanîbûnê, giranî dane ser çand û jiyana civakî.

Yek: Nasname û xwastekên şexsî di nav kurdan de bi cîvakê re giredayî ye, lê di civaka Swîsrî de azadbûna keseyatiyê heye.

Du: Li Swîsrê di sazî û jiyana civakî de cîh û warên jin û zarokan heye. Lê di nav civaka kurdan de ev dikevin bin siya desthilatdariya mêran.

Sê: Bi karanîn û pêşketina teknîkî di civaka Swîsrî de rûniştiye. Lê di nav civaka kurdan yên ji nifşa yekem ew cihana teknîkî wek rojgeranên biyanî li der û dora wan digindire.

Ji aliyê beşdaran ve jî hinek dîtinên cuda hatin ziman. Nifşên yekem birêz Apo bi dîtinên Ewropî rexne kirin. Lê ji aliyên nifşên dûwem dîtinên wî di cîh de hatin dîtin û bi kêfxweşî hatin pejirandin.



www.arsivakurdi.org



Li gor birêz Apo pirsgirêka herî mezin a di navberê her du nifşanda ye û sedema wê jî birêz Alî Çîftcî ku ji gundê Kelhasan e, bi çavekî pedagog, di gotara xwe de anî ziman.

Birêz Alî sedemên hevnefamkirinê di zimanê rojane de dibîne. Ji ber ku zimanê rojane û herêmî nebûye zimanê perwerdê û îdara dewletê û zimanekî ku malbat, nikaribin rojname, kitêp pê bixwînin, xwe pê îfadekirin jî ji bo wana zehmet e.

Li gor birêz Alî, zarokên ku zimanê dayîka xwe rind fêr bûne; ne tenê zimanên biyanî hîn zû fêr dibin, hem jî xwe zûtirîn entegreyê jiyanê dikin.

Prof. Hacî Akman ku bi xwe etnolog e; ji me re qala çanda kurdan a dîrokî kir ku îro di muzexaneyên Ewropa û Amerîka de bi navên gelên derdora Kurdistanê tên naskirin.

Birêz Hacî bang li hemû kurdan dike ku ew li çanda xwe xwedî derkevin û bidin nasîn.

Li dawiya panelê, ez yek bi yek bi xebatkarên Bîrnebûnê re hatim nasîn. Me li kevîya çemê Rheinê, hem zikê xwe û hem jî giyanê xwe yê ku birçîbûna kurdiyeke xweşik bû, têr kir.

www.arsivakurd.org

# Helbijartinên şaredariyan

Muzaffer Özgür

Di dema helbijartinên şaredariyan da ez li welêt bûm. Carcaran beşdarî civîn, çalekî û sohbetan jî bûm. Meriv dikane pir gotinan bîne ziman, lê çend meh derbasbûn û li ser înternetê jî gelek agahdarî, dîtin û şîrove hatin nivîsandin. Ji bo wê jî bi kurtayî çend gotin û statîstîkan binivsînim ku di arşîva me de bimînin.

Li Anatoliya Navîn gelek navêndan endamên partiyên kurdan hebûn. Lê li Kulu û Cihanbeyliyê kurd, bi nasnameya xwe ya kurdî beşdarî helbijartinê bûn û di helbijartinê de jî cihekî baş girtin. Ji bo wan encaman jî ez ê behsa wan bikim.

Di destpekê de li herêma me, kurdên aliyê me bûn du kom. Koma aliyê BDPê û koma piştgirên AKPê. Li ser endamên serokatiya şarederiya Kulu û Cihanbeyliyê û ji bo endamên meclîsa şaredariyê gelek gengeşî çêbûn. Îmkan, şert û mercên dewletê di bin destê AKPê dabûn û wan jî ew bi serkeftî bi kar anîn. Di destê aliyê BDPê da jî jiyana kurdbûyînê û nasname ya kurdî hebû.

Partiyeka kurdan a din jî ji bo endamên xwe bişîne meclîsa şaredariyên me, di nav çalekiye da bû; HAK-PAR. HAK-PARê namzetên serokatiya şarederiyên ji bo herdu navenda nîşan da. HAK-PARê li dawiya helbijartine de encameka baş bi dest nexist.

Meriv dikane di dawiya helbijartine de gelek gotinan bîne ziman. Lê ez ê tenê bi du beşan li ser karûbarê helbijartinê bisekinim.

### Karûbarê propagandayê

Karûbaren siyasî bê rexistin bisernakevin. Li her du navenda jî partiyên kurdan ne li ser hevbûn. Cîh û warên wan ya endam, dost û alîgirên xwe, herin bidin û bîstinin, tunebûn an jî herdem nevekirîbûn. Buroyên wan bi zorê an jî ji bo xatira li ser kaxizê hatibûn avakirin. Kêmasiya mezin jî kurdên ji gundên me, xwe li derwayî wan karûbaran girtibûn.

Li Cihanbeyliyê, piranî jî li Kuluyê partiya BDP, ji bo amadebûna helbijartinê kesên ku bi salan piştgirî dane nasnameya kurd û di nav karûbarê weletpareziyê de kar kirine nekanîbû mobîlîze bike, bi wan re bide û bistîne, wan di nav karûbarê helbijartinê de bihêle.



www.arsivakurdi.org



Newroz li Kuluyê Foto: Haci Güneş

Ji bo helbijartina endamên seroketiya şaredariyên me gelek gengeşî çêbûn. Ew bû pirseka mezin. Xeletî çêbûn. Navenda BDPê ji aliyekî de, piştgirên BDP yên li Avrupa dijîn ji aliyekî de, ji aliyekî da jî kes an jî kesên li herêma me dijîn û di nav karûbarê BDPê de kardikirin jî, ji aliyekî de li berxwe didan ku daxwazên wan biserkevin. Ew ji bo destpekê şaş bû.

Endamên serokatiya şaredariyê bi tayin hatin helbijartin. Biryara dawiyê merkeza partiyê da. Eger endamên partiyê û aligirên xwe bi helvesteka demokratîk, bi xwe endamên xwe hilbijartina hîn baş dibû. Li Cihanbeyliyê neh, li Kuluyê jî sê berendam hebûn.

Dema lîsteya endamên meclîsa şaredariya eşkere bû, hat zanîn ku kadroyên hatin helbijartin têra karûbarê pêşerojê nakin. Hêz û tecrûbe an jî zanebûn qelek kêm bû.

Gundên me yên mezin wek Încow, Xelika-Gölyazi, Omeran û heta cîhekî jî Cutika-Tuzyaka, Xelika-Karacadax ji ber nifûs, hêz û giraniya wan ya di nav kurdên me de nehatibû hesibandin.

### Dema propaganda û karûbarê helbijartinê

Civaka Kurdên Anatoliya Navîn wek gelê me yê Kurdîstanê hat hesibandin. Rastiya herêma me, kultur û nasnameya me ya taybet nehate dîtin. Cîh û warê civaka me te da dijî, di nav tirkan da ye. Gotinên propagandayên wek Kurdistanê Tirk tirsandibûn. Ji ber wê jî kurdên me xwe paşda girtin, pasîf man.

Di navbera navenda partiyê û rêxistina Konyayê de, dubendî hebû.

2014 KULU BELEDİYE BAŞKANLIĞI PARTİLERİN OY DAĞILIM LİSTESİ

| KÖY ADI | BBP | AKP | MP | SP | BDP | BTP | CHP | MHP | Toplam | %BDP | %AKP |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Acıkuyu | 4 | 160 | 0 | 0 | 104 | 2 | 1 | 1 | 272 | 38.2 | 58.8 |
| Ağılbaşı | 0 | 82 | 1 | 16 | 2 | 0 | 8 | 21 | 130 | 1.5 | 63.1 |
| Kulu/Alpaslan | 5 | 699 | 4 | 100 | 190 | 2 | 0 | 31 | 1031 | 18.4 | 67.8 |
| Kulu/Camikebir | 2 | 702 | 0 | 33 | 111 | 2 | 47 | 430 | 1327 | 8.4 | 52.9 |
| Kulu/Cumhuriyet | 6 | 469 | 2 | 25 | 149 | 6 | 37 | 323 | 1017 | 14.7 | 46.1 |
| Kulu/Değirmenözü | 0 | 78 | 1 | 2 | 18 | 1 | 2 | 58 | 160 | 11.3 | 48.8 |
| Kulu/F.S.Mehmet | 5 | 516 | 3 | 71 | 182 | 5 | 18 | 356 | 1156 | 15.7 | 44.6 |
| Kulu/Karapınar | 1 | 247 | 0 | 34 | 218 | 5 | 19 | 131 | 655 | 33.3 | 37.7 |
| Kulu/Karşıyaka | 1 | 640 | 0 | 89 | 281 | 7 | 39 | 467 | 1524 | 18.4 | 42.0 |
| Kulu/Kemaliye | 4 | 677 | 3 | 28 | 169 | 3 | 35 | 514 | 1433 | 11.8 | 47.2 |
| Kulu/Yeni Mahalle | 5 | 952 | 2 | 98 | 361 | 12 | 26 | 480 | 1936 | 18.6 | 49.2 |
| Kulu/Dinek | 0 | 103 | 0 | 11 | 0 | 0 | 8 | 104 | 226 | 0.0 | 45.6 |
| TOPLAM KULU/Mrkz | 29 | 5083 | 13 | 491 | 1679 | 43 | 231 | 2894 | 10465 | 16.0 | 48.6 |
| Altılar | 1 | 73 | 0 | 3 | 324 | 3 | 2 | 2 | 408 | 79.4 | 17.9 |
| Arşıncı | 1 | 55 | 0 | 99 | 25 | 0 | 0 | 2 | 182 | 13.7 | 30.2 |
| Bahadırlı | 1 | 23 | 0 | 3 | 115 | 0 | 0 | 9 | 151 | 76.2 | 15.2 |
| Beşkardeş | 3 | 276 | 1 | 10 | 202 | 8 | 6 | 2 | 508 | 39.8 | 54.3 |
| Boğazören | 0 | 61 | 0 | 2 | 15 | 0 | 9 | 26 | 113 | 13.3 | 54.0 |
| Bozan | 2 | 284 | 2 | 20 | 89 | 2 | 5 | 7 | 411 | 21.7 | 69.1 |
| Burunağıl | 0 | 99 | 0 | 5 | 46 | 0 | 0 | 1 | 151 | 30.5 | 65.6 |
| Canımana | 4 | 284 | 1 | 9 | 200 | 8 | 6 | 6 | 518 | 38.6 | 54.8 |
| Celep | 2 | 213 | 2 | 8 | 184 | 4 | 2 | 4 | 419 | 43.9 | 50.8 |
| Dipdede | 3 | 298 | 1 | 16 | 180 | 1 | 5 | 20 | 524 | 34.4 | 56.9 |
| Doğutepe | 0 | 50 | 0 | 1 | 3 | 0 | 0 | 19 | 73 | 4.1 | 68.5 |
| Fevziye | 0 | 46 | 0 | 1 | 1 | 0 | 2 | 17 | 67 | 1.5 | 68.7 |
| Gökler | 0 | 65 | 0 | 1 | 0 | 0 | 1 | 4 | 71 | 0.0 | 91.5 |
| Güzelyayla | 0 | 70 | 0 | 1 | 79 | 1 | 1 | 1 | 153 | 51.6 | 45.8 |
| Hisar | 0 | 20 | 0 | 11 | 4 | 0 | 0 | 1 | 36 | 11.1 | 55.6 |
| Karacadağ | 9 | 289 | 0 | 6 | 711 | 8 | 2 | 16 | 1041 | 68.3 | 27.8 |
| Karacadere | 1 | 218 | 0 | 28 | 61 | 3 | 1 | 4 | 316 | 19.3 | 69.0 |
| Kırkkuyu | 0 | 94 | 0 | 2 | 2 | 0 | 1 | 89 | 188 | 1.1 | 50.0 |
| Kırkpınar | 3 | 241 | 0 | 42 | 325 | 8 | 0 | 5 | 624 | 52.1 | 38.6 |
| Kozanlı | 3 | 785 | 3 | 16 | 6 | 0 | 29 | 454 | 1296 | 0.5 | 60.6 |
| Kömüşini | 0 | 150 | 1 | 6 | 0 | 1 | 2 | 31 | 191 | 0.0 | 78.5 |
| Köşker | 0 | 14 | 1 | 3 | 0 | 1 | 27 | 25 | 71 | 0.0 | 19.7 |
| Sarıyayla | 0 | 94 | 0 | 2 | 0 | 0 | 0 | 26 | 122 | 0.0 | 77.0 |
| Seyitahmetli | 0 | 9 | 0 | 5 | 0 | 0 | 2 | 13 | 29 | 0.0 | 31.0 |
| Soğukkuyu | 2 | 107 | 0 | 8 | 40 | 0 | 9 | 2 | 168 | 23.8 | 63.7 |
| Şerefli | 2 | 53 | 0 | 3 | 100 | 3 | 3 | 3 | 167 | 59.9 | 31.7 |
| Tavlıören | 5 | 32 | 0 | 7 | 146 | 6 | 1 | 4 | 201 | 72.6 | 15.9 |
| Tavşançalı | 59 | 1261 | 0 | 57 | 741 | 21 | 10 | 16 | 2165 | 34.2 | 58.2 |
| Tuzyaka | 3 | 716 | 0 | 40 | 99 | 3 | 3 | 24 | 888 | 11.1 | 80.6 |
| Yaraşlı | 1 | 235 | 2 | 27 | 3 | 0 | 8 | 99 | 375 | 0.8 | 62.7 |
| Yazıçayır | 1 | 175 | 1 | 80 | 299 | 3 | 2 | 3 | 564 | 53.0 | 31.0 |
| Yeşiltepe | 1 | 64 | 0 | 6 | 47 | 0 | 0 | 0 | 118 | 39.8 | 54.2 |
| Yeşilyurt | 8 | 198 | 0 | 23 | 178 | 9 | 1 | 2 | 419 | 42.5 | 47.3 |
| Zincirlikuyu | 5 | 198 | 0 | 22 | 736 | 5 | 4 | 8 | 978 | 75.3 | 20.2 |
| Genel Toplam | 119 | 11985 | 31 | 1081 | 6748 | 143 | 415 | 4299 | 24821 | 27.2 | 48.3 |

Rêxistina bajarê Konya guh nedida kes an jî koman. Li gor ditînên xwe kar birêva dibir.

Proje û planên şaredariyê birêva bibin tunebûn an jî kêmasî gelek bûn.

Propaganda piranî bi zimanê Tirkî dihatin kirin. Stran, govend û çend gotin bi kurdî bûn. Bi rastî li kuluyê Esîn Xanimê bi kurdî xeber dida, gelek jî li ber xwe da. Ez wê jî bîrnekim.

Kesekî ji aliyê me xwe nedabû pêş û wek serokê organîzasyonê li pêş cîh negirtibû.

Rewşenbîrên me bi hêz di nav karûbarê helbijartine cîh negirtin.

Partiyên din propagandayên qirêj birêve birin, di nav hevûdu da eşkere nebe jî alikarî dan hev, kurdan guh nedan wan û antî propaganda wan nekirin. Li herdu merkezan jî tirk ji bo serkeftina kurdan tirsîn, eşkere nebe jî di nav hevûdu da yekitî ava kirin. Mînak; li Cihanbeylîyê partiya Saadetê xwe ji helbijartinê paşda kişand.

Pirozkirina cejna Newrozê li merkeza Kuluyê şaş bû. Li navenda Kuluyê 5 hezaran zedetir Kurd hatibûn şenahiyê. Tirkên li merkezê dijîn ji hêza Kurdan tirsîn. Li hemberî wan jî berê xwe dan AKPê. Omera an jî Xelika ji bo şênahiya Newrozê baş dibûn. Lê, hevala gotinên gelek kesan nedan berçawan.



www.arsivakurdi.org

Kurdan, hejmara reyên li navenda Kulu û Cîhanbeyliyê baş tespît nekiribûn. Kurdên ji Botanê, kurdên ji Agiriyê dihatin ziman lê endamên wan koman reyên xwe pir digotin û %100 jî bi çavekî garantî lê mezedikirin, di dawiyê de encam şitekî din derket.

Kurdên me ji gotina '*Eş başkanlık*' fêhm nekirin ew nav an jî birevabirin nehate eşkere kirin.

Hêza aborî an jî plankirineka aborî tunebû. Bi berhevkirina alikariyê kar dimeşî. Li dawiyê kurdan serokatiya şaredariya herdu merkezan jî bi dest nexistin. Lê hêzbûna xwe, hebûna xwe xurt kirin. Civan û jinan di nav civaka me de cîhekî baş girtin. Di nav gund û kurdên me de têkiliyên germ avabûn. Nasnamaya kurd eşkerê hat parastin. Ez bawer im kurd li Anatoliya Navîn, bi ziman û nasnameyê xwe, di helbijartinên pêşeroje de dikanin bi ser kevin. Rêyên din tu car bi serkefti nabin.

Di Meclîsa Şaredariya Cihanbeyliyê de 9 û ya Kuluyê de jî 5 endaman cîh girtin. Ev hezeka mezin e. Ew kesên hatin helbijartin li gor şert û jiyana civaka me kar bikin dikanin nasnameya kurdî peşda bibin. Bi gotinên sloganî û tûj peşda çûyîn gelek zehmet e.

| | | |
|---|---|---|
| **Şaredariya bajarê mezin a Konyayê:**<br>BDP | % 1,9 | 23.420 |
| <u>HAK-PAR</u><br>Hak ve Özgürlükler Partisi | % 0,1 | 1.424 |

| **Cihanbeyli** | Seroketiya şarederiyê | Meclîsa şaredariyê |
|---|---|---|
| AKP | % 46,5 (14.066) | % 46,8 |
| BDP | % 36,5 (11.031) | % 35,4 |

| **Kulu** | Seroketiya şaredariyê | Meclîsa şaredariyê |
|---|---|---|
| AKP | % 48,3 (11.985) | % 49,9 |
| BDP | % 27,2 (6.748) | % 24,2 |

www.arsivakurdi.org

# BDP-HDP ve İç Anadolu Kürtleri

Fatin Kanat

2014 Mart'ında yapılan seçimlerin ardından oluşan tablo, kuşkusuz çok farklı okumalara açık. Gezi direnişi ve 17 Aralık operasyonlarından sonra muhalif partilerden çok AKP'nin ne oranda oy alacağının merakla beklendiği bir süreç yaşandı. CHP birkaç puanlık bir artışla yetindi. MHP normal potansiyelinin üstüne çıktı. AKP'nin yaşadığı büyük sarsıntıya rağmen sandıkta yeterince tepki görmemiş olması, insanların güvenebileceği bir alternatifi görememiş olmalarıyla açıklanabilir ancak. AKP'ye karşı CHP-MHP-Cemaat koalisyonu insanların desteğini alabilecek bir çekiciliğe sahip değildi zaten. Ne yapıp yapmadığı az çok bilinen AKP'ye karşı, ne yapacağı bir fikir vermeyen muhalif bloğun tercih edilmesi haliyle pek mümkün olmadı. Ancak yine de 52 milyon seçmenden yaklaşık 6 milyonun oy kullanmamış olması ve 2 milyondan fazla oyun da geçersiz sayılması, AKP'nin % 43'lük oranının gerçekte 4-5 puan düşmesi anlamına gelebileceği de hesaba katılmalı.

BDP ise HDP ile birlikte ele alındığında beklentinin altında kaldı. % 7'ye yaklaşan toplam oran, tatmin edici olmaktan uzaktı. Kürdistan'da yeni belediyelerin eskiye göre yüksek oy oranlarıyla alınması ciddi bir başarıyken, elde tutulan belediyelerde yaşanan düşüş üzerinde durmaya değerdi. Yeni kurulan bir parti olarak başlangıç zorluklarını aşmada, özellikle Kürtlerin de desteğiyle, pek zorlanmayan HDP'nin durumu da yeni tartışmalara gebe görünüyor. Kendi doğal oluşum süreci dışındaki müdahalelerin ve biçilen rollerin olumlu bir etki yaratmadığı ve partinin gelişimini sekteye uğrattığını söylemek yanlış olmaz sanırım.

Son olarak BDP'nin Haziran ayında HDP'ye katılım amaçlı bir tasfiye kongresi toparlayacak olması da ciddi bir rahatsızlık yaratmış durumda. Bugüne kadar kurulan legal partiler hep devlet tarafından kapatılmışken ilk defa bir parti –BDP- kendi kurucuları tarafından kapatılmış olacak. Bunun giderilemez sancıları ve olumsuz sonuçları olacaktır diye düşünüyorum. BDP'nin HDP'ye katılımı, HDP içindeki sol-sosyalist potansiyeli de etkisizleştirecek, ayrıca BDP'ye bağlı seçmenin HDP'ye yönelmesi sanıldığı kadar kolay olma-

www.arsivakurdi.org

yacaktır. HDP'nin bir çatı partisi olma işlevi ve rüştünü Kürdistan dışında ispatlama düşüncesi oy olarak pek karşılık bulmamıştır.

Mersin ve Konya'da BDP'yle seçime katılmak da başka bir tuhaflıktı. İstanbul ve İzmir için ileri sürülebilir gerekçeler Mersin ve Konya için de geçerliydi. "Kürdistan'da BDP, Batıda HDP" biçimindeki formüle Mersin ve Konya'nın dahil edilmemesi hem anlaşılamadı hem de izah edilemedi. Mersin'de Akdeniz belediyesinin küçük bir farkla da olsa kazanılması BDP açısından bir başarı sayılsa da normal olarak başta ileri sürülmüş gerekçelere göre bu seçimi alması gereken parti BDP değil HDP olmalıydı. Aynı mantıkla Kulu ve Cihanbeyli için de, yarışan parti HDP olmalıydı.

### Kulu-Cihanbeyli sonuçları üzerine

Köyleriyle birlikte toplam Kürt nüfusu % 60-70 civarında olan her iki ilçedeki beklenti, seçimleri BDP'nin alacağı şeklindeydi. Seçim çalışmaları güçlü katılımlar ve büyük mitinglerle yürütüldü. Yukarıdaki oranlar da hesaba katıldığında doğal olarak başkanlığın BDP'li adaylarca kazanılacağı gibi bir hava oluştu.

Fakat sonuçlar beklendiği gibi çıkmadı. Bunun görünür birkaç sebebi var bence. Özellikle genç kuşaktan hemşerilerimizin, Konya-Ankara arasını Kürdistan toprağı sayma gibi bir eğilimi var. Şakayla karışık dile gelen bu niteleme, özellikle Türk ve Kürt olmayan nüfusu rahatsız edebilecek bir nitelemedir.

İç Anadolulu ve Türkiyeli Kürtler olarak, sorunlarımızı ve taleplerimizi dile getirmek, eğitimden sanata vb. kurumlaşmalara, kendi kültürümüze uygun bir yapılanma isteğinde bulunmak haklı ve anlaşılır bir yönelimken, kanımca Kürdistani bir dil ve söylem tutturarak politika yapmak yöre gerçekliğini hesap edemeyen bir yöneliş olmuştur.

"Bunlar buraları Kürdistan'a çevirecek" şeklindeki spekülasyonları da kattığımızda taşların nasıl yerine oturduğunu anlayabiliriz. Bu tabloya, şişirilen korkuyla Kürt olmayanları bir araya getiren bir Kürt karşıtlığının eklenmesi bir yana, mevcut huzurun, böyle bir gelişme sonucu alt üst olacağı düşüncesiyle "aman AKP'nin şekli bozulmasın" diyen Kürtleri de dahil ettiğimizde, Cihanbeyli ve Kulu'da seçimlerin neden kaybedilmiş olduğu sorusunun cevabını bulmuş ve gelecekte hangi yanlışları yapmamamız gerektiğini de anlamış oluruz.

www.arsivakurdi.org

# Cihanbeyli ve Kulu Belediye Seçimleri üzerine bir değerlendirme

Ahmet Gezer

Seçim çalışmalarında alanlara ve alanın nabzına hakim olduk, fakat masa başındaki hesap ve hilelere hakim olamadık. Osmanlı'da oyun bitmez. Türkler, Kürtlerin Cihanbeyli ve Kulu´yu yönetmemeleri için birleştiler.

Biz, Kürtlerin belediyeleri kazanacak kadar bir araya/yan yana getiremedik. Bu, BDP ve seçim çalışmalarına katılanların yapması gereken bir öz eleştiridir. Cihanbeyli ve Kulu'da siyaset yapacak pek çok haklı alan ve argümana sahip olamamıza rağmen başaramadık. Eleştiri ve özeleştiriyi kendi içimizde yaptığımız zaman yararlı olur ve dikkate alınır. Cografik koşulların yanında, siyasal, sosyal, kültürel ve ekonomik etken ve sebepleri de sıralayabiliriz.

Cihanbeyli ve Kulu seçimlerini kazanamadık, ama ait olduğumuz menşei, ve öze dönüşü kazandık.

Orta Anadolu Kürtleri değerlerine sahip çıktı ve verdikleri destekle bunu teyit ettiler. Cihanbeyli ve Kulu Kürtlerin ana teması, bölgede varlığımızın bilinmesi ve kabulü için oyumu partime, BDP´ye veriyorum. Bu mesajın herkes tarafından iyi okunması gerekir, analiz ve değerlendirmeler bunun üzerinden yapılmalıdır.

Kimlik talebi: Orta Anadolu'da şavaş yok, baskı ve zulüm yok. Ekonomik bağımlılık yok, bölgenin % 90`nı Avrupa'da çalışan gurbetçilere endekslidir. Bunun yanı sıra sosyal ve kültürel baskı, bölge baskısı var, korku ve sindirme politikası kendini his ettiriyor. Orta Anadolu'da yaşayan Kürtler, kimlik taleplerini demokratik bir şekilde BDP'ye verdikleri destek ile ortaya koydular.

Cihanbeyli ve Kulu Kürtleri zamanın'da sosyalistleri, solcula-

www.arsivakurdi.org



Newroz li Kuluyê Foto: Haci Güneş

rı, demokrat ve sosyaldemokratları omuzlarında taşıyarak belediye başkanlığı koltuklarına yerleştirdiler. Fakat, BDP olarak bu kesimden, yeterli ve istenilen desteği göremedik.

Çocuklar *‚Ez BDP'yî me'* diyor, bayrak ve flamalarla bizleri karşılıyorlardı her yerde. Kadınlar, yaşlısı ve genci. Kürdistanla kıyaslanmaz, ama benzeri bir gelişmedir. Cihanbeyli ve Kulu'da bu seçimde en değerli kazanım kadınlarımız. Orta Anadolu Kürtleri arasında, kendi kimlik ve öz benlikleri ile rengini ve örnek kadını temsil ediyorlardı. Kadınlar, sayıları az olmasına rağmen özverili bir çalışma yürüttüler.

82 yaşındaki yaşlı amca şöyle diyordu; ***Oyumu BDP ve Kürtlere veriyorum***. Bu 300 yıldan bu yana Anadolu topraklarına gelişimizin ve varlığımızın bir teminatıdır.

Newroz kutlamaları Orta Anadolu'da görülmemiş görkemli bir şölendi. Her yaşta insanın katılması dikkat çekiciydi. Kulu Newroz kutlamalarına Beşbin, Incov kutlamalarına onbinin üzerinde katılım oldu.

www.arsivakurd.org



Foto: Haci Kardoxî

# Pêşengeha xaliyên bi dest çekîrî li Muzexaneya Etnografî ya li Stockholmê

Altun Başaran

Du jinên kurdên Anatoliyê, ji gundê Omera, Zeliha Agrili û Esme Bulduk bi hevkariya "Verdandi" yê, di meha adarê de, li Muzexaneya Etnografiyê pêşenhega "tewna xaliya" li darxistin.

Ev pêşengeh di meha adarê de her rojên şemiyan sê heftan ji xelkê re vekirî bû. Ji aliyê swêdiyan ve pir bal kişand ser xwe û xaliyên ku bi tevnê ji aliyê Zexê û Besê ve hatibûn çêkirin, dihatin firotin.

Verdandî rêxistineka karkeran a civakî ya adil e. Ji bo civateka bi adelet û wekhevî, li dij xizanî, nîjadperestî û ji bo civaketak refah kar dike. Bi tu rêxistinên siyasi û oli re ne girediyayi ye. Herwiha yek ji wan rêxistinên ji bo ev kesên ku bi salan bêkar mane re îmkana peydakirina kar, dixebite.

Verdandî deriyê xwe ji jinên kurdên li Fitjê dijin re jî vedike. Li Stockholmê li taxa bi navê Fîtjê gelek malbatên kurd lê dimînin. Giraniya wan ji kurdên Anatoliyê, ji gundê



Bes, Leyal, Zex û Altun — Foto: Haci Kardoxî



www.arsivakurd.org

Omeran e. Piraniya jinên Omera yên ku li gund mezin bûne biçûkiya xwe de fêrî çêkirina tevnê bûne. Ev mîrasa hunerîya kurdan nesil bi nesil het îro anîne.

Dema bar dikin tên li derwayî welêt bîra ev hunera xwe nakin, bi salan di hişên xwe de veşartî dihêlin. Nizanin ku ev hunera destî, mîrasa kalûpîrên xwe ciqas bi qimet e!...

Bi alikariya projeya Verdandiyê îmkan ên peyda kirin, ji bo dezgeha tevnê daynin heta welêt diçin û li Konyayê malzemê tevnê distînin. Ji bo ku wek orijînalên ku li welêt dihat çêkirin, heta risên ku bi rengên tabiî hatine ristin jî li welêt tînin Swêdê û dest bi çêkirina xaliyên destî yên kurda dikin.

Bi rêya vê projê Verdandîyê ev jinên ku bi salan di malê xwe de bê îş û derweyî civatê mabûn, dibin xwedî kar û bi hunera xwe kêfxweş dimînin û serê me kurdan jî serbilind dikin.

Min li ser karê wan ê destî, hunera tevnê û xebata wan a bi Verdandiyê re, bi Zeliha Agrili û Esme Bulduk sohbetek kir.

**Esma Bulduk:**
Ez heft salî bûm, min dest bi kare tevnê kir. Mala me li zozanê, li Bircê bû. Birc, li Anatoliya Navîn, girêdayî gundê Omera ye.

Bavê min ji eşîra Îzola bû. Ez neşandim mektebê. Got; tu keçik î, çirkî here mektebê. Li wê wextê keçik nediçûne mektebê. Keçik didan ber tevnan. Diya min jina bavê min a sisîyan bû. Bavê min çubu Meletiyê, ji wir anîbû. Bavê min jê pir mestir bû.

Ji arê diya min tevn nedizanîn. Min ji xwîşkên xwe yên mezin hêvisî. Keçikên Omera bi tevnên xwe serbilind bûn. Ji dakên xwe têvisîn. Ji bo ku dîya min nedizanî her tim bavira (bala) min dikişand.

Tevn ji min re bu hunerek. Min jê pir hez dikir. Cêyizê xwe hemû min



Foto: Altun Başaran

bi xwe kir. Wextak daweta min bû, hertişt min bi îmkanên xwe çêkir.

Pê ser bilind bûm. Oda xwe bi cêyizê xwe xemiland. Gîştik destkirê min bûn, kêfa min li cih bû. Min mêre xwe bi xwe bijart!..

Du zarê me çê bûn. Piştî dawetê mêrê min hat Swêdê. Dura jî em hatin. Du zarê me jî li vir çê bûn. Bûn du keç û du kur. Îro ev mezin in, her çara jî xwendin, xwadî mesleg in, Ez wekî bavê xwe nafikirim. xwendin

www.arsivakurdi.org

muhim e. Min keçikên xwe nedan ber tevnê, wekî kurên xwe dan xwendinê. Bi wan serbilind im ku ew li ser karê xwe ne. Mêrê min xwendî bû. Lê ez ne xwenda bûm. Wekî hun dizanin, li ba me, vê wextê keç hertim li paş bûn.

Mêrê min, ji rojak hatiye vir de, li postexanê kar dike. Ez li mal bum. Xwadiya malê, dîya zaroka, jina malê bûm. Wextak zar mezin bûn min li malê xwe bi tenê didît. Ne zimanê swêdî, ne zimanê tirkî... min tenê bi kurdî dizani. Rojekê meriya min Zexê, dizanî ku ez karê tevnê baş dizanim, li şaredariya Botkyrka, ya li Stockholmê tişt vusa çêkirine ku ji bo hunera me imkanek e. Ji bo vê ez çûm ba Zexê, me bi wan re deng kir. Gotin: baş e. Min dest bi kar kir, serkeftî bûm. Kêfa min hema jê ra hat, ji bo ku em serketin, resmê me di rojnamada wekî hunermend, li ser dinifisandin. Xaltika mêrê min Altunê bahsa vê ji jinaka svêdîya bi navê Anne Murray, şefa Muzexaneya Etnografiyê ya berê (Etnografiska muzeet) kiriye. Ev bi hev ra di komela dostaniya swêdî û kurd/Svensk-Kurdiska Vänskapsföreningenê da kar dikin. Çend salan li ber wê jinên kurd ji bajarê Wanê vunan ji bo hunera xaliya (kelim). Kêfa Annê ji ra tê. Rojekê hatin Verdandiyê, li Fittjê resmên me kişandin.

Ez û bi Zexê va rojekê bi tevnan va em birin muzexanê. Li pişt mehekê hatin ez, Zex û berpirsa me ya Verdandîyê Leyla, em birin Muzexaneya Etnografiyê. Muzexane li coleka fereh di xaniyekî xanikî sor da bû. Wexta ez nêzik xanîyê muzexaneyê bûm, zaroktiya min a li zozana bavê bavê min, hat bîra min. Min xwe li zozana bavê, xwe hîs kir. Kêfa min pir jê re hat. Em sê heftan li wir bûn. Tewna me bala swêdiyan dikişand.

Min li wir dît ku karê min ê destî di arê de neçûye!.. Swêdiyên ku dihatin seredana pêşengeha me ya tevnê pir pirs dikirin... lê min tam nedikarî bersiva pirsên swêdiyan bidim, ev ji bo min kêmasiyek bû!.. lê min ji wir pir fayde dît û niha bi karê tevnê serbilind im!


Besa Hecî Mistefê, Zexa Heco, Eyşa Dewrêş, Anne Murray û Altun Başaran

www.arsivakurdi.org

**Zeliha Agrili:** Navê min Zex e, bi min ra bi tirki dibêjin; Zeliha Ağrili. Bi Besê va ji gundekî ne, gundê Omera, merivê hevdi nî.

Jiyana li Omara wek hemû keçikên omerî min jî biçûktiya xwe dest bi hunera tevnê kir. Li gundê Omera ji heft saliyan bigrê heta heftê saliyan, gîştik tevnê dizanin. Li ba me edet bu, keçik tevnê fêrbibin.

Mêrê min ji salên 80î da hat Swêdê. Dura ez bi zare xwe ve hatim. Ez zimanê swêdî hinekê hêvîsîm. Ne pir, lê qasî ku pê herim û werim. Min li NKê dest bi karê pakijîyê kir. 15 salan li wir kar kir. Karê min ji dest min çû, bêkar mam.

Li Verdandêyê kar dane min. Hertişt ji dest min dihat; xwarin, vexwarin, zar mêskirin. Dibezim her tiştekî... hertişt ji dest min tê.

Rojekê, em pir jin bunî, me behsa tevnê dikir, ji bo kî li ba me hunereka ji dest me tê.

Nîvî jinên Omera li Fittyayê rudinin. Gîştik jî tevnan dizanin. Ên ku vêkar in, tên li Verdandiyê rudinin, wextê xwe derbas dikin. Şefa me, Leylaya suryanî , got; ez ji we ra îmkanekê çêkim. Ez bi şefê xwe yî swêdî re deng bikim, eger îzin da em bi hev re herin bajarê Konyayê, malzeme bistînin û ji we ra tevnan dagirên. Veng ma. Rojekê Leylayê



Foto: Altun Başaran

hat û got; xebereka min a rind ji we ra heye. Şefê Verdandîyê îmkan peyda kirine ji bo çêkirina tevnan.

Me perê xwe girt û em çûn bajarê Konyayê, me ris, deziyên darî û barê xwe stand û em hatin Verdandîya li Fîtyayê. Vê carê kî dê dagrê?

Dagirtina tevna herkes nizanê. Ev jî zehmeteke bi sere xwe ye. Me xeber heyna ku jinaka Omera li bajarê Gävlê, dagirtinê tevna dizane, heye. Em çûn ji Gävlê, jineka bi navê Ecê, anî û me tevna xwe dagirt.

Nedibû, hertim em herin Ecê bînin. Rojekê min ev zehmetiya ji Besê re qal kir.

Besê got: ez hem dagirtina tevna û hem jê çêkirina tewna dizanim.

Me got; rind e, em Besê bînin Verdandîyê. Besê jî dest bi karê Verdandîyê kir û me bi hev ra pir xalî çêkirin û firtên swêdiyan.

Swêdiyan ji tevna me pir hez kirin û bala wan pir dikişand ser vî karê me yê destî û li her derê Swêdê dihatin serdana Verdandiya li Fîtyê.

www.arsivakurdi.org

# Wêne

Seyfi Doğan

Ber dûkana Heci Hesenî Xelî Feta Qirê li Xelika Jor/Karacadag. Sal 1969 û mêha tebaxê.

Wêne yî ji alîyê Heci Hesenî hatîyê geyd kirin.

Wêne yî tarî xuya dike. Roj çûyê ava an jî esmanî bi ewr bû.

Wexa xermana ye. Dema, dengî dohlê û zurnêyê. Huco, Zîya, Kazo û Şêxo yê gund, bi Zurnê û Dohlê Şên dikirin.Huco û Zîya zurnê û Kazo û Şêxo hostê dohlê bûn.

Salên 1960 û 1970î demeke ku civat û şaxis, li nasnamê xwe digerinê bû. Barên, şerî duyemîn li ser milên însanan sivik bû. Argumentên ku di dû şerê duyemîn popular bûn, edî hikmê xwe namebû. Refaha ku însan têda dijinî gelek bilind bibû. Mîrov, edî li ber xwe mezedikir. Bi taybêtî jî cîvavanan (Li wir dixazim bibêjim –"Xortan". Cimkî; kecan û jinan we demê di civatêda vekirî cîh girtinê xwe, gelek zehmet bû). Xor-



Mehmet Behzatoğlu, Mahmud Ateş, Ali Akgül, Osman Kılınçalp, Mulla Koyuncu, Nuh Ateş



www.arsivakurdi.org



Heci Hesenî Xelî Feta Qirê

tan dixwest ku dûnê berve heyînê û duristîyê biguherin. Alîkariyê gelan û welatên bindest bikin.

Gava ku meri li kinc, hal û hereketên xortan dinêre, xortanîyêke ku zanyarên demê xwe û zanayê serdemê xwe yê xuya dikine.

Meriv, deme ku li wêne dinêre, xuya dike ku xortan, kincên hema hema li gor dilê xwe û demê li xwe kirine. Heya cand salan ber vê, xortan nedikanîn serqot derkevin derve. Ew guherandin, îro pir banal têyê, lê wexte ku însan, li gor cîh û demê difikire, gavên gelek dirêj bûn.

Di eynî salê de, Apollo 11 revîya hîve bû. Wexte ku Neil Armstrong, li ser hîvê êvirî û gava xwe avit, wî got; "***That's one small step for a man, one giant leap for mankind***" (ji bo însanekî gavake kin e lê ji bo beşerîyete gavake mezi ne.)

Şerê Vietnamê, serhildana xortanîyê dûnê û Ewropê têsîre xwe li cîwanîyê xortên Xelika jî kir û ew fikrên nû hîn bûn û ew fikrana, bi xelkê xwe parve dikirin.

Xortan, bes ne bi kinc û bergên xwe pêşvexwaz bûn. Ew, bi fikrên xwe jî pêşvexwaz bûn û li dijî neheqîyê û zordarîyê bûn. Ji bo mafên neteviyê Kurdistanê li berxwedidan.

Bi rastî jî weng bû. Ez şahîdim xortên şoreşger bûn Civata û ekonomîya girtî, edî nedikerî wanan di bin kontrolê xwe kin.

Hevldanan wanan, ji bo azadiyê civatê û ferdî nayê inkar kirinê. Wanan, ji bo wek hevîyê jin û meran ji daxwazîyê hebûn. Wê demê Hemitî Hecê (Mahmut Ateş) li Êngurîyê li Ticari Ilimler Akademisiyê dixwand. Wî, tekîlîya xwe bi kurdên ji Kurdistanê ve hebû û behse rewşê kurdan û qala sazbûna DDKO dikir.

Dûkanê Heci Hesen ê li navendê gund bû.Wî jî wek dûkanên din, lewlewiyê ser bi şekir, loqim, bîskîwî, hêjîr, muj, lewlewî, şekerî bena, fistiq û şekerî kewke û havînî û zivistanî jî sewza û mêwayî demsal difirot.

Wê wextê pere gelek kêm bû. Kêm bûnîyêke wang. Mezinan digot; "pere ketine strîyên keran". Dan û standin piranî bi deyn an jî serbiser bû. Wê demê fîlîk û hirîyê bi qiymet bû. Gundîyan ihtiyacên xwe biharê bi hirîyê an jî bi fîlîk û havînê

www.arsivakurdi.org

bi genim dikirîn. Wek min li jor nivisandî yê, hema hema dan û standinê bi deyn bû. Malbatan deftere xwe li ser dukanan hebûn. Wexte ku bi deyn tişt dikirîn digotin, "li ser defterê"

Berber û îmamî gund li ser xermanê heqi xwe distand. Ê bi erebê hespan an jî bi kerê li nav xermana digerîyana û heqî xwe yî salê kom dikirin.

Tiştekî dinî bi teybêtî hebû. Xortan deftere xwe, li ba beqalan vedikirin. Defterê, li gor aborî malbatê xortan, sînorekî xwe bû. Defter vekirin; bi deyn beqalîyê distandin û li xermana deynê xwe didan. Piranî deynê xwe serbiser bi genim didan.

Deftere min jî li ser dukanê Heci Hesen hebû. Hedê min, heta yarimak genim bû. Genimî wê wexte gelek bi qiymet bû.

Min yêk caran jî berî ku ez bizinên me yê cibir berdim colê û bicerînim, min fîlîk nî xwe dibir dukanê Heci Hesen û bi lewlewîyên ser bi şekir dida û guh dida ser kilamên ku li ser sêlikan bûn.

Dûkanê Heci Hesen,bîlhesa cîhê xortên xwandivan bû. Xortên ku wê wextê, li lîsê û zaningehan dixwandin, li wir digêştine hevdu. Cîwanan, li wir li ser mesele dûne û kurdan munaqeşe û sohbêt dikirin. Dukanê Heci Hesen, wek meclîse kê heqanî bû. Herkesekî dikanî fikirê xwe bibêja.

Musamahake fireh ji bo fikrên cuda hebû. Toleransa ji bo fikrên cûda nişana Kurdên Xelika ye. Ji bo wê jî, însanên Xelika dikanin xwe bê endîşê îfade bikin. Ew rehatîyêkê dide însanan û meriv xwe azad hîs dike. Ew jî însanan li cîhe û waran sewdaser dike.

Milî Hesê (Molla Koyuncu) yek caran li dukanê li bilûrê texist. Me, en pir ji zirafî, qamîş qul,emê hemê û ji zirafî Uskî Mile hezdikir.

Dûkanê Heci Hesen ciqas cîhê xortan bû jî, ji her emrî insan dihatin. Bi wê vêsîlê jî, mîrasên zanatiyê, folklor, henek, tarix û irf û adet ji nifşakê werdigerin nifşakê.

Heci Hesen, mîrovekî nûjenîxwaz zîrek û jêhatî bû. Heci Hesen sêwî mezin bû. Lê wî, stuyê xwe li ber sewîtîyê qet xar nekir û sêwitî wek qeder qebûl nedikir.

Wî, bi salan û bi sabir karkir û rewza xwe yê aborîyê pêşda bir. Bû xwedanî kamyon û mal û milk û zarokên xwe bi xwendi dan.

Heci Hesen, ji tiştên nu hezdikir. Meraqdar û nujênperest bû.

Wê gavê, dezgehên ragihan pir û pir kêm bûn. Radio li her mala kê tune bû. Televîzyon xelkê hinge nav



www.arsivakurdi.org

nebihîsti bû.Li dukane Heci Hesen, radio û plak hebûn. Min bi xwe, li dûkanê wî, pir guh da yê ser Ayşê Şanê, Nuri Sesigüzel û Mahsuni Şerif.

Berêvarê, me guhdarîyê Radio Erîvanê û Dengê Îranê BeŞî Kurdî dikir. Meryem Xane ,Kawis Axa, Xerabetê Xaco û Mehmet Arif Cîzrewî jîyana me bi stranên xwe zengîn û dûnê li ser me fireh dikirin.

Wê demê Ayşê Şanê stranên xwe, bi pîranî tevle Kurmancî û bi Tirkî distran. Ayşê Şan bicesaret bû.Wê gavê bi Kurmancî kilam gotin; cesaret lazim bû. Ew jî, li ba Eyşê hebû. Strane xwe navdar û siftê *"Ez Xezal im"*

Mahsunî Şerif, kilamê xwe yê wê demê tarî bi nav û deng *"işte gidiyorum ceşmi siyahim û uyan coban uyan"* bû.

Nuri Sesîgüzel, wê wextê pir bi navdar bû. Kilama wî ya bi navê "Kürd Cemal" mêşûr bû. Kürd Cemalî, kurdê sihbizinî, ji Bayburtê bû. Malbate wî, di destpêka 1950 da bara Êngûrîyê kiribûn. Kürd Cemalî; însanakî dîlawêr(kabadayi) buyê. Ew î li despêka 1960 da li Êngûrîyê tê kuştin.

Mijara, berhemeşanoyê Haldun Taner "Keşanli Ali Destani" ji heqate Kürd Cemali îlham digre. Lê Haldun Taner, ji belayên ku werine seri wî ditirse, ji bo vê jî nawêre ku navê berhemê xwe, Kürd Cemali lêne.

Meryem Xan gelek navdar bû. Dengekî xwe yê xemgîn û tijî hesret hebû. Demeka min, guh dida ser wê, dilê min zîz dibû. Kilamê wê yê "Dotmamê" berêvarê wek petîyê agirekî şên li nav gund dil bi dil digerî.

Xerabete Xaco, kilama Ewdalê Zeynikê bi ziravekî zîz hayê dikir û dengê wî, berêvarê li ser gund wek enerjîyêke ku meriya zindî dike, diherikî.

www.arsivakurdi.org

# ZÛGOTINOK–II

## Mem Xelîkan

1–
Hêklo mêklo
Çalim çêklo
Heştiyê kewê
Li ber kewê
Memo firî
Hewan dirî
Sa li ser
Wir de rî

2–
Rovî rovî rindike
Serê dilê rovî guleke
Rovî çû mala xalê xwe
Xwarî ye nan çay û ava xwe
Bihejmire bihejmire bişt û çarê xwe

3–
Kil kil kil meşkê
Deştê kewanî ye bişkê
Têr neda me hevreşkê

4–
Kot kot
Te çêlek dot
Te maşt çêkir
Tem maşt firot
Te penêr çêkir
Tep enêr firot

5–
Rojek çûme nav dîka
Xeberdidan hêdika
Ha xiringê xiringê
Êtima poz qulingê

www.arsivakurdi.org

# HELBEST

## Jiyan xweş e

Aştî
Di perê kevokên spî
Bask şikestî de
Bîrindar û bêkes e

Hêvî
Di awirê dergûşên Rojava
Çavreş belek de
Dibiriqe û dibrûse

Azadî
Di lûla tifinga bûkên
Dest bi hinne de
Xweş xweş dimeşe

Jîyan
Bi aştî hêvî û âzadî ye
Serbilind û bi rûmet
êrîn û xweş e.

Mem Xelîkan

## Baran dibarî

Baran dibarî
Şev reş û tarî
Dibarî baran
Bi ser bejna te da
Brûskên hov
Şewqa xwe dida
Dida bejna te

Dilopên baranê
Li ser rûyên te
Wek hêsirên çavan
Wek stêrkên esman
Di wan çavên te da
Diçeliqîya
Derya evînê

Mûlla Evîndar

www.arsivakurdi.org

# Çîkolata

Nesrin Bayram

Dema bavê min hat îzinê, apê Hesen (Hasî Çawsor) hat ba bavê min û di deştê wî de kaxitek hebû: “Mehmed, evqas deyinê te heye!” bavê min mat ma. Çimkî deyinê wî pir pir bû.

Bavê min wiha got: Hesen, ev çi ye, te çi firotiye me? Hesen jî wiha bersiva da: Ma te negotibû zarok çi dixwezin bide wan, min jî da.

Bavê min şaş mabû, nikarîbû ji me hêrs bibe çimkî dilê wî nedihat.

Lê diviya çareyekî jê vê arîşê re bibîne û ji apê Hesen re got; ji vir û şûnde heta di bin lîsteyê de îmzeya Ayşê (dayika min) tinebe tu tiştekî nadî zarokan. Bi vî awayî bavê min û apê Hesen li hev kirin.

Em jî çend mehan bi îmzeya dayika xwe çûn û hatin. Di lîsteya me de rûn, maqarna, ava tomatîz û şeş lib çîkolatên tadelle hebûn.

Me biriya rojên berê dikir. Ka ew rojên ku çi dilê me bixwesta me dikirî. Rojekê, em hemû kom bûn û me lîsteya ku dayika me amade kiribû, vekola. Me zanîn ku em li boşê bêçîkolata mane.

Ji ber ku îmzeya dayika min tîpa A û li kêleka wê jî sê tîpên biçûk ên u û li ser wan jî xetek hatibû kişandin.

Sûk li ber çavên min mîna kolaneke mezin xuya dikir. Dema ku min dixwest, ji vî serê sûkê herim serê din ez neçar dimam li nîvê rê de bêhna xwe vedim.

Di dikanan de du sê karton biskuvît û çend qutî çîkolata hebûn. Lê ew li ber çavên min pir dihatin dîtin. Helbet kirtasî jî hebû.

Bavê min li derveyî welêt bû. Bavê me ji xwedanê dukanê teme kiribû ku bi deyn bide me. Dema bavê me dihate îzinê diçû deyinên me didan. Em şeş zarok bûn. Ê herî mezin 12 sal û yê herî biçûk jî şeş salî bû.

Çi rêya me bi sûkê biketa em diçûn dûkanê Hasî Çawsor. Me digotê: çîkolata, metro, şekîr û cûm bide…

Bavê min ji Haso re gotibû zarok çi dixwezin bide wan. Me jî ev dizanîbû û ji ber wê jî serê her saetê em diçûn dikanê me çîkolata, biskuvît û şekirok distand. Sal 1987 bû, me êdî şoriyê derxistibû.

Kînga dilê me bixwesta, em diçûn dikanê û me ji xwe re tişt dikirrîn û bêyî ku dayika me pê bizanibe, me dixwar û xilas dikir.



www.arsivakurdi.org

Me nav xwe de biryar da ku em lîsteyên nû binivîsin û îmzeya dayika xwe jî bavêjin binê lîstê. Lê di lîsteyê de tenê çîkolata û şekirok hebe. Me ev erk jî da xûşka min a herî mezin, ji ber ku wê ji hemûyan zêdetir xwendibû.

Me çend mehan bi vî rengî derbas kir. Rojekê xûşkek min dilê wê çîkolata xwest û ji xûşka min a mezin xwest ku lîsteyekê binivîse û îmzeya dayika min jî bavêje binî wê û bi vî rengî dewra me ya çîkolata bidawî hat.

Xûşka min a mezin jî hinek tişt li ser kaxitê nivîsandibû û dabû destê xûşka min a biçûk. Lê tê de şekirok û çîkolata nebû, dema wê lîste dinivîsand ez dikeniyam.

Apê Hesen jî ew lîste hildabû û hatibû mala me û bi vî awayî dayika min pê hesiya ku çima me di heyama wan çend mehan de qet ji wê çîkolata û şekirok nexwastiye.

Nayê bîra min ka wê rojê me lêdan xwar an na! Lê çîkolatên ku min xwaribû tama wan heta niha jî di bin diranên min de ne.

# PÊKENOK

*Mûlla Evîndar*

## „GERÇEK ZIMAN"

Du heval di navbera hev da sohbetê dikin:

– Yaw ‚kardeşim', min hezar carî go, ‚ne laftan anlamaz adamsın' yaw!

Ewê din dibê:

– ‚Kardeşim' tuyî pir ‚kalın kafalı' yî, ‚asıl' tu ‚anlamiş' nakî!

Bi ser wan da yekî din tê û dibê:

– Yaw va sohbetê we weha çi ye lo! Tu nedizanî Tirkî ye, ne dizanî Kurmancî ye! Hele li min mêzekin ez tenê kelîmeke bi Tirkî jî "kariştirmîş" nakim, 'gerçek' ziman ez deng dikim, divê merî tim 'öz kimlik'ê xwe, zimanê xwe 'korumuşke' ! 'Doğru ye, ne doğru' ye!



www.arsivakurdi.org

# Li ser qirkirina Dêrsîmê



Berî 77 salan, ji heft heyvî heta 70 salî xelkê Kurd li Dêrsimê hate qir kirin. Komkujîyeke hovane û wêranker bi serê Dêrsimê hat kirin. 4ê gulana 1937a bi biryara fermî ya dewleta Tirk êrîşeke mezin ya leşkerî bi armanca birandina xelkekê hate kirin. Dewleta Tirk bi kîn û nefreteke tolhildanî ji erd û esmanî êrişî Dêrsimê kir. Bi hezaran Dêrsimî kuştin, hind jî birîndar û bi hezaran jî bi darê zorê dane koç kirin û bi rê ve telifandin.

Qirkirineke, jenosîdeke fermî bi biryara dewlet û hukûmetê, bi belge hate kirin. Tiştekî wisa li çu derê dinyayê nehatîye dîtin. Ya ku dewlet û hukûmeta Tirk bi serê xelkê Kurd li Dêrsimê înayî çu dewletan bi serê dijminên xwe yên herî dijwar jî neyînane. Ji bilî komkujî, birîndarî û koçeke malwêranî navê Dêrsimê jî bi qanûneke taybetî hate guhorîn û kirin Tuncelî. Dilê Kurdan ji ber wê jenodsîda mezin bi kul e û çu caran ji bîr nakin û divêt ji bîr jî nekin. Kurd divêt hem wê kiryarê hem jî kirdarên wê bûyerê ji bîr nekin, di hiş û bîrên xwe da adeta bikolin ku çu caran jê neçe.

4ê Gulanê da vê jenosîda bi serê xelkê me li Dêrsimê hatîye înan piştî 77 salan jî bi hemû hêza xwe ve careke dî şermizar dike. Berpirsiyarên dewlet û hukûmeta xwûnxwar çi dibêjin, polîtîka giştî çi encam bide ferq nake û ev hovîtîya li ser xelkê me hatîye kirin, rûperekî reş yê dîroka bi xwûn ya dewlet û hukûmeta Tirk e. Di her bîrînana van rojên xembar û dilsoj da divêt xelkê me, rêber, pêşeng û têkoşerên bizava neteweyî û welatî, hem hafizaya xwe ron û geş bigirin hem jî di doza hesab pirsîna ji dijminî da biryardêr bin, têkoşîna xwe sist û lawaz nekin.

Hesaba jenosîda Dêrsimê divêt ji dijminî bête pirsîn.

Jenosîda Dêrsimê nayê ji bîr kirin, divêt neyê ji bîr kirin.

Konseya Rêvebir ya KNKê
4 Gulan 2014, Bruksel



www.arsivakurdi.org

# Werger

## Bertolt Brecht*

Wergêr: Nuh Ate

## TOFAN

Di reva ji ber kîndaran a berve Dewletên Yekbûyî da
Ji nişkava em pêhesiyan ku keştiya me ya piçûk kut dawestî.
Bi dirêjahiya şevekê û rojeke bitûn
Ew li bilindahiya Luzonê di Deryayê Çînê da ma.
Hena digotin, ji avûrûyê tofanê da ye ya ku li Bakûrê di hevra dibû
Hen jî ji keştiyên almanan ên korsan ditirsiyan.
Gîştan
Digotin şalê tofan be û ne alman bin.

### JI MIRINIYA HEVKARA MIN M.S. BIŞÛNDA

I

Di sala nehan a reva ji ber Hitler da
Ji ber rêwîtiyan xiş û xal
Ji serma û birçîtiya zivistana Finlandayê
Û payîna li benda paşaporta bo çûyîna parzemînekî din
Can da hevrê Steffin
Li bajarê sor Moskaw.

*Berthot Brecht (10.02.1898–14.08.1956) helbestvanekî alman î navdar e. Ji helbestên wî yên salên 1941–1947an.

www.arsivakurdi.org

II
Generalê min ket
Leşkerê min ket

Şagirdê min lêxist û çû
Mamosteyê min serî helanî û çû

Berdestkê min çû
Zarokê ku min xwedî dikir çû.
III
Gava weda hat û miriniya nebêveger
Bi milkutayî pênc parçeyên xerabûyî ên pişikê bi min nimandin
Bi zehmet e, jiyîn tenê bi ya şeşan ji wê payîn
Bi lez min 500 temeh tevhev bi xwe ra kaş kirin.
Tiştên, ku aniha û sibê, sala têyî
Û di heft salên ji niha şûn da bên halkirin
Pirsan dikime bê hesab, yên girîng, tenê ji alîyê wê da bên
Bersivandin
Û di bin barekî ha da
Ew bi hêsanî mir.

IV
Bi bîranîna fêrhosteya min a piçûk
Çavên wê, keskiya arê sorkirî
Û kevnefîstanê wê yê şar bi ser va
Û jêrkênar fereh, min navê wê
Hêstêra oryon lê kir, komhêstêra Steffinê li ezmên.
Bi çavlêgerandin û serîhêjandinê lê nêrî
Carcar kuxîneke sivik dibihîzim.

www.arsivakurdi.org

## LÎSTEYA WENDABÛYÎYAN

Reva ji keştiya ku binav dibû, sîyarbûna li yeka binav dibûyî
Hîn yeka nû xuya nake, dinivîsim
Li ser parçek kaxiz navên yên
Ku li derûdora min nemayî.
Mamosteya piçûk ji koma karkeran
M a r g a r e t e  S t e f f i n. Di nav qursa fêrkariyê da
Teqetnemayî ji ber revîtiyê
Nexwaş ket û mir kesetiya hêşiyar.
Her weha ez cîhiştim dijberiyê min yê pir zana, lêgerê tiştê nû
W a l t e r  B e n j a m i n. Li ser sînora qedexe
Westiyayî ji ber teqîbatê, xwe dirêj kir.
Car din payî nebû ew.
Û yê bi îstiqrar, jîyanhez
K a r l  K o c h, hosteyê mineqeşeyê
Li Romaya bîhn biserketî xwe berteref kir,
SS yên hêrişkar xapandin.
Û êdi qet tiştekî nabihîzim ji
Wênekar C a s p a r  N e h e r. Qet nebe dikanim wî ji lîsteyê derbixim!

Miriniyê vana birin. Yên din
Ji min bi dûr ketin sewa hevcedariyên jîyanê
Yan jî sewa luksê.

www.arsivakurdi.org

# SÎYARÊ TÊRİKA-2

Dr. Mikaîlî

Osê bi çavên kelgirî û xembar li dûmana ku ji hesp̧i Sîyariya dertê, mêze kîr. Xu bi tenê hîs dikir, li ser vê erdî tik û tenê. Bê kes û bêçar! Wek sêwîkî bê dê û bê bav. Mîna cewrikî avetine çolê! Eger imkânik hewûya wî ye jî xu bivêta ser pişta hesp̧ekî kumêt û tev li sîyariye Têrika bûwa. Dile wî ketî wû ew serbestî û azadiya wana, rehetiya wana. Le ew camertî ji destî wî nedihat, ne dikarî. Him dixwast ji nav êlê, eşîrê bireve, him jî nediwêrî. Dest jê nedûwû. Le hêndi xu yek ji wan jî hîs ne dikir. Os xortekî 15 salî, lawe Usî Hecîbrêm wû. Biraki xu yi din jî hewu, Meh. Meh ji Osê çûktir bû. Osê xu di nav va konana da rind hîs nedikir. Ew heyat, ew der ji wî ra pirr teng dihat. Ew pê difetisiya. Dixwast here bajari mezin.Tişt û dunya din nas biki, biwîni. Di nav mezinahiya wirda anda biwi. Ji ber kû.....

Rokê li ber kona, diya wî Zêw Xanim ê ferax dişuştin. Pişta nîvro. Germa havînê bû. Bêrîvanî ji mî dotinê hatiwûn, şîre xu li makînê xistîwûn, şîva nîvro xwariwûn û di bin sîya konada xu dirêj kirûwûn. Westiya wûn, bîna xu didan ber xu.

Mêr jî di konî mezin î berê(Qebile) da rûniştîwûn. Hînika titûn dikşandin, hînika ji di nav xu da qala pêz, şivanti û çêrê dikirin. Hînik jî wan di şûna xu da xewda çûwûn, li ber xu da dikirin xûri xûr...

Osê jî bi çend zaro din va kuçik bera hev didan. Ew yek ji lîstikên wana a jê hezkirî wû. Digotin ka kuçikî kê hîn notir e! Kuçika xu berra hevdan, bi serbin hev ketin û çûn li Zêw xatûnê, dîya Osê qelivîn. Wê ferax fol dişuştin. Ew li erdê dirêj bû, ferax jî di nav qilêr û heriyê da man. Zêw jineke pirr nerm û bi sebr bû.Tu bi ser kesî ra nediqîrya û dila kesî nekestandî wû. Le di nav ew xirecire da wê bi hêrsekê deriye lengeriyê ku di destî wê da, duşuşt, avêt zarya. Ew bersiveka bê heşî bû, te ye bigota qey xu anda kirîbû.

Deriye lengeriyê firya hat li devrû yî Osê ket. Os qe li benda vê newû. Ew gêj bû û li ser erdê dirêj bû. Ji dêv û pozda xûn hat der. Wî deste xu avêt devruyî xu, xwast xûnê pa ke, le xûn nedimiçiqî. Wî çikir ew nesekinî. Xunêka sor, germaxî, şor. Ew ziq bû, li



www.arsivakurdi.org

şûna xu ma û bi çavên tirsyayî li diya xu nêrî. Diya wî jî li wî. Herdû jî şaş biwûn. Gavik şûnva heşe Zewê hatin sêri ku, halî Osê ne hale. Hema bezya çû hindê, ew da hemêza xû. Bi serî kitanê xu xûna ku ji dev lêvi wî da diheriki û li ser sînga wî ya xort da belaw diwe pa kir. Bîhna xuyê wî ya teze keti poz bivîla wê. Zêwe zûva ew hemêz nekiriwû. Ew bi ber sînga xu va kişand kir û qirya;

–Hawar, hawar min çikir, min çikir! Min xali li serî xu bikira, Ez qe tunewûma. Kor bû ma!

Min lawike xu yî delal birindar kir! Bigîhêjine cîranno!

Bi hawara wê mêr ji kona bazdan derva. Cotkar, şivan û paqij jî gî meşyan hatin li dor wan dawastiyan. Ji nav jini eşîrêda Zeynê ji birîn dermankirin û nexaşiya fehm dikir, ew him ebeya wan bû jî. Qe tu ji tiştikî ne ditirsiya. Wê hema xu avêt pêş û Os ji hemêza dya wî hilgirt.

–Ka ez li binêrim!

Dî ku lêva jor a Osê diryayî, ji navda bû yî di ciya û xûn ji wir tê. Hema kitana Zêwê bi destî xu çirand li hev nûr kir û ji mêra ra got;

–Ka titûnê ku şewitiyî bidin mi!

Wana hema ew cixaleye ku dikşandin, li ser leva wan bûn, dani wê, wê ew kir nav kitanê û bi ser lêvêda kir. Deste xu qasî deh–panzde gava li ser hişt, heta ku xûn miçiqiya. Dû ra parçek ji kitanê jî li ser lêvê û bi stûyi wî va pêçand û bi hevra girêda, kir girêk. Du mêr ketin bin qoncî Osê û ew birin konî bavê.

Zêw wakîna li şûna xû ma wû, hîn tu mahne nedawû ew hereketa xu. Wê di heyata xu da tu li kesi jî nexisti wû, xerawi pê nekiri wu.

Zeyn û Kevot xanim hatin bi destî wê girtin û birin konî aşxanê. Ku ew li kon da rûnişt, bi yekva dev bi girî kir, mîna zarokikî çûk digîriya. Denge giryî wê zozan girt. Mêr û jin, zaro û şivan gî şaş bûn. Di nav eşîrêda ji bo tiştikî akîna, girîna jinekê bi dengekî bilind ne normal wû, eyb bû jî. Le Zêwê tu hale xu yî ku eyb û fediyê bifikiri tunne wû, heşe wê ne li sêri wûn. Zeynê deste xu avet serî wê, pore wê yî hinnekirî, sor, di bin kitanêda derketiwûn, li hev belaw belawî biwûn. Cane xuyî kalî gewr xanê dikir. Zeynê pore wê mista, ew berbi xu kişand, wek çêleka li ber şîrda, heta ku ew aş bû, wakîna man. Jine din gî li dor wan bê deng, seri li berxu xuzkirî rûniştîwûn. Ditirsiyan ku dengeki derxin. Ji derva viziniya moz û mirîşka, arriniya kera û ewtîniya kuçika tevlihev diwû. Os di nav konî bavî xu da, di hemêza apî xu yî Ismail da bê deng, bê livandin



www.arsivakurdi.org

ma wû. Bavê di bin çavada bi tirs li wî dinêrî. Mêri bera Hecibramiya, Huse Xanê, Topo, Elike Mertalê û hîneka din jî çaya ku  ji wan ra hatiwû, bi dengekî bilind qult dikirin, vedixwarin. Firi fira wan bû.

Lêva Osê nika bi titûna dawûn ser, zîz zîz dişewitî. Hînek titûn jî diket devî wî. Ji bo yi ku wî nedikarî li hindê mezina êşa xu bini ziman, titûn di devî xu da jî tuv derva biki, wî ew titûna hindik hindik cû, bi cûyîna titûnê kêfa wî dihat, Gavik şûnda ew tenê bi tehma titûne ku dicû va mijûl bû. Wî êş û azara ku ji lêvê da dihat, ji xu va bîr kir. Û di hemeza apî xu yî İsmail da ket xewê.

Wana ew di nav konda li ser kulavikî dirêj kirin, bixu jî çaya ku ji wan ra hatiwû û sar biwû, dîsa teze kirin û bi titûnê va, bê deng wexwarin. Hundire kon bi dûyî titûna wan tiji bû. Di hêlikê da jî ew zarokê ku bi Osê va tevhev kûçik berra hevdawûn, bi dilikî xusucdar, ji mezina ra qala ew nebaşiya ku bûyi dikirin. Melleyî eşîrê, Hec Osman jî şîret didan wan ku bira tu carik din ew tiştana newin.

–Xortno hûn diwînin, ku meriya bala xu nedayê, ji lîstekeka çûk, qezayê mezine biwin ! Gere meri bizani, li ku çi tê kirin û nê kirin!

–Erê erê!, Mil Osman rast diwêji! digotin meri din û bi serî xu jî ew tesdiq dikirin.

Osê heta kû birîna xu rind bû 3–4 hefte derbas bû. Wi nedikarî bixu û vexu. Zewê weka ku ew hînnû hatiyî dunê û wî dîsa dimêjîni, ew dikir hemêza xû , yek bi yek pariyê wî di devi xu da dicûn û didan devî wî. Ava wi dida wî. Piştî 4–5 hefta birîna lêva wî rind bû, le herdû aliya bi hevra negirt. Di navberê leva da valahî ma wû. Ku wî deng dikir, ji devî wi tise tisik derdiket. Hevala, Zarya jî qerfe xu bi wî dikirin û nave wî "Lêfse" lêkiriwûn, yanê lêfdirya. Ew nava qe li dilî Osê nedihat û pê pirr bi hêrs diket. Yek cara jî ji bo yî vê li zarya dixist. Ew Osê ku ji hevala hezdikir, rûken çûwû, li şûna wî yekî eqsî, jixu su, bê heval û bê deng hatiwû. Bi tenê digeriya, kesî ra deng nedikir û nediwû heval. Ji wê bûyerê şûnva bi diya xu va tu kelimekek jî nekir. Wî di ziki xu da diya xu bi ew halî sucdar dikir. Ew sarwûna wî bala dê jî dikşand û pê pir diêşiya.

Bi mêri xu Usê va li çarekê digeriyan, le tiştik ji destî wan nedihat. Ji wî ra bi dizika, beyî haya wî le hewi, ayet nivîsandin, nusqe çêkirin û kirin nav kinci wî. Ava lêxandî dan wî. Ji gundî Şêxanê ji mala Şêx yek anîn û Kone ku ew lê radikevi dan xwandinê. Le tu tiştikî lê feyde  nekir. Wî ji vana ji sûd, feyde vernegirt. Herçik mezin diwû, diwû xort, zêdetir xu ji nav civakê paşva dikşand. Hevala qala dilgirtina

xu dikirin, diçûn dawata û li keçika dinêrin. Le wî xu tev wana nedikir. Herçiqas di zikî xuda vê pirr bixwazi jî, ew ne dikir.

### Dile xu kiriwû keçikekê

Hew, Hewa Yeho. Hew yeka bejn dirêj û nav zirav wû. Guli wê heta navê dihatin, çavî xu ne kesk, ne jî heşin bûn, weka ava çema heşinaxî wûn.Yeka camêr bû tu ji tiştikî neditirsiya. Di şerda li ber mêra dimeşiya. Ji pir xorta camêrtir bû. Li hêsp siyar diwû, şûr bi kar dianî û tîr davêt. Bi xortava diket iddiê. Pirr cara jî le hember wana bi ser diket. Ji bo yî wê, vê ra digotin Deli Hewê. Ji bavî wî ra jî ji bo yî camertiya wî digotin Deli Yeho. Ew pêlwane Mikaîliya wû. Osê jî dile xu ketiwû ew camertiya wê. Hewê jî ew pê dizanî.Yek cara ji hevra desmalek, yan jî ku aqtar ji nav kona da derbas diwûn, Osê şekire akide, helaw, loqim û nok dikirandin ji wê ra dişandin.

Ose li dû dirandina lêvê xu tu cardin bi vê ra deng nekir. Ku ew didî, jê direviya. Hewê yek cara fedi û eyb li hêlikê dihişt û dida dû wî, ji boyî ku bi wî ra çend gotina bidi û bistîni. Li çavî wî mêzikî. Bejna xu yî dirêj li ber wî ba ke. Jê ra naza biki! Le Osê ew firsend nedida wê. Hewê li ber vê pirr cara xu diavêt taldekî û bi hers digîriya. Êlê jî dilgirtina wan dizanî û ew wek dergistî dihesiwandin.

Rokê berbangê avêt, dîkan ban dan, Zêw heşar bû, rawû limiya (Nimêj) siwê biki. Çû derva av ro mîsin kir, gore xu derxistin, piye xu vemalîn û destmê girt. Berî ku heri ser limiyê, wê jî qezaya hatiyî serî Osê vir da tim diçû li konî ku zaro têda radikevin, li Osê dinêrî dû ra li ser limiyê disekinî. Deriye konî wî veda, mezekir ku Os ne li şûna xu yî. Nîvîne wî nîv vekirîni, çû deste xû da ser şûna ku ev lê radiket, ew der sar bû. Bi xu xu got evî zûva heşar bû yî. Diwe ku derkeve mîzê yan jî li heywana dinêri. Çû li derva nêrî, tu li derikî ew nedî. Ket zik konî Mêrî xu, ha bi dengekî sivik ban wî kir;

–Uso! Uso! rawe rawe, Os di cilla da tunneyî! Usê nîv bi xewî, nîv bi payî;

–Os çima tunni? çûyî ku?

–Nizanim, le ne di nav nîvîna da ye û li derva jî nini.

Gumanek bi tirsê va tevlihev, hindik hindik di dilî wê da gir diwû û pê sere wê ditevizî.

A ku ew tim jê ditirsiyan, hatiwû serî wan? Os ji wan reviya bû? Osê ew terikandiwûn?

Usê jî ji nêrina wê fehmkir ku ew çi difikiri.

Li bendê sekinîn ku herkes ji xewê rawîn û dû ra yek û yek li kona geriyan ji wan pirskirin.Tu kesî ew nedîwî wû.

Telaşik kete nav eşîrê... Dû ra mêr û xorte Êlê li hespi xu siyar bûn li dor çaralî va hespe xu ajotin. Çiqas Êlê Kurmanc û Tirkmena hewûn lê geriyan. Li alî Mirdêsa, Canbega, Reşiya, Şexzîniya, Zirka, Ruta, Sewêda, heta bigehije Elkecika lê geryan, le ew tunne bû. Te ye bigota erd qelişiyî û ew di navda con bû yî. Tu derik nehiştin ku jê bipirsin. Ew gera li wî, bi roya dewam kir. Le tu kesî Os nedî wû. Os di şevekê da anda bû wû.

Mikailiya wextek şûnda, beri wexta zivistanê hat, ji bo ku herin qişlê, kone xu berhev kirin li hesp, ker û heştira barkirin û ber bi rê ketin. Ji çiyayê Aydosa diçûn Anatoliya navin, hoza Modan.

Di mala Usî Hecibrêm da xemgîniyeka bê emsal hewû. Ken û şahî li dev û rûyî wan tunne wû. Eşir jî bi wan va diljikestî û birîndar bû. Reş girêda wû... Ku kerwan derket rê, Zêwê sere xu tim li paş xuva wû. Stû lê diqetî, le wê xu çex nedikir. Li benda siya, bejna Osî xuyî delal û zirav bû. Li benda dengî wî wû ku li dû wan biqîre û biwêje;

“Eyê, Eyê ezî va mi, li virim, bisekin! li benda min bisekin!“

Hêlikê da jî giriye çavi xu ji xelkê vedişart. Le ne di destî wê da wû. Hêstir mina barane ji çava da xar diwû, dirijiyan. Girîyeke bê deng û ji dilda, Te ye bigota qey ronikiya çavi we dirijiyan. Qundik li ser zindarîki kon bû wû bi çavê xuyî gir û bi tirs li wê dinêrî.

Do ye heyî...

**GIRÎNGÎYEK:**
**Numra kontoya me hatiye guhartin!**
**A nû ev a li jêr e:**
**BIC/SWIFT: DABASESX**
IBAN: **SE23 1200 0000 0123 5020 6874**

www.arsivakurdi.org

Xizmetên wergerê li Swêdê

# Tecrûbeya kurdî (1973–2013)

Rohat Alakom

### Destpêk

Piştî ku di sala 2003an de li Tirkiyê di qanûna cezayê de hin guhartin kirin, kurdan nefeseke kûr hilda û ji barekî sedsalane, ji ezîyet û îşkenceke mezin xelas bûn.[1] Êdî mirovên kurd dikarin di dadgehan de bi zimanê kurdî xwe biparêzin. Gava ku hewce be, kesên girtî dikarin ji xwe re wergêrên kurd bidin anîn. Derketina vê qanûnê gaveke giring e ku divê hin gavên din vê bişopînin. Xala ku di vê qanûnê de cîh girtiye û dibêje "Çûyînên wergêran ji xezîneya dewletê nayên dayîn" divê bê guhartin. Ne bi tenê ev guhartina qanûnî, divê ev kêmasî di pêşerojê de ji holê rabe û di pratîkê de hin gavên din jî bên avîtin. Yek ji van gavên herî mezin bêgûman perwerdebûn yan jî perwerdekirina wergêran e (terciman). Hin rojname û organên medyayê li Swêdê jî cîh dane vê nûçeyê.[2] Dîrok û tecrûbeya wergera (tercimanî) kurdî li Swêdê ku li jêr em bi kurtî pêşkêş dikin, di vî warî de dikare rênîşandar û alîkar be.

Di dîrokê de mirovan heta niha hertim hewl daye, cedandiye wekî bi tehrekî baştirîn gotinên hev fam bikin, bidin–bistînin. Tiştekî şikbir li vira tune ye. Ev

---

1 (*) Gelek spas ji bo Reşo Zîlan, Mistefa Aydogan, Hesenê Metê, Qasim Savaş, Şervan Buyukkaya û Nedret Bîlîcî ku bi agahî û zanyarîyên kêrhatî, bi tecrûbeyên xwe yên salane, bi belge û çavkanî alîkariya nivîsîna vê lêkolîna min kirin. Şaxeke vê nivîsê li Tirkiyê bi tirkî hat weşandin (*İsveç Tercümanlık Hizmetlerinin Kürtçe Tecrübesi*, Toplumsal Tarih, nr 233/2013).

Ev qanûna piştî ku di Rojnameya Fermî (*Resmi Gazete* 31/1 2013) de hat weşandin, derbasî pratîkê bû. Ev karîkaturê jorîn ku di vê nivîsê de hatiye bi kar anîn, di versîyona dîjîtal ya Rojnameya *Star*ê de li Tirkiyê hatiye weşandin: *Kürtçe tercümanı oy birliği ile mahkemede çeviri yaptı*, (http://haber.stargazete.com 1/2 2013).

2 Kurdiska tillåts i turkiska domstolar, *STV Nyheter* 25/1 2003.



www.arsivakurdi.org

yeka, mafekî mirovî ye, li her derê cîhanê derbas dibe yan jî divê derbas bibe. Dîroka kar û tecrûbeyên wergerê gelek kevn e. Nivîskarê romayî Plinius dibêje ku Împaratoriya Romayê ji bo têkilîyên xwe ligel kom û gelên Qafkasyayê pêk bîne hewcedarî bi 130 wergêran bûye.[1] Kurdî belkî jî yek ji van zimanên wergerê bûye. Berî hezar salan Qafkasya mîna herêma çand û zimanan hatiye nasîn. Gerokên ereb ên kevn vedibêjin ku li van deran bi sedan ziman hatine axaftin.[2]

Di salên kevn de dema nûnerên dewletan çûne welatên bîyanî hertim wergêrên xwe yên herî jêhatî û pispor bi xwe re birine. Ew kesan, di zimanê ewropayî de bi navê dragoman dihatin nasîn (koka vê gotinê wisa xuya dibe ku ji peyva erebî tercuman hatiye). Kesên ku ewropayîyan di piçûktîya xwe de hînî wergerê dikirin bi navê “Zarokên Zimên” (Enfants de Langue) hatine nasîn. Lê belê ev îfadeya di lîtteratûrê de zêdetir wek ”Lawikên zimên” (Bi almanî “Sprachknaben”, bi osmanî ,”dil oğlanları” derbas dibe.[3]

Di destpêka sedsala 17an de têkilîyên osmanî û swêdî xurt bûne. Swêdê jî wek welatên ewropayî yên din giranîyeke mezin daye ser perwerdekirina wergêran. Dema em dîroka swêdî raçav dikin, em rastî navên wergêrên navdar tên, wek Mouradgea d’Ohsson û Johannes Kolmodin. Ew avahîya ku îro li Îstenbolê li taxa Taksîmê ”Enstîtûya Lêgerînî ya Swêdî li Îstenbolê” lê ye (di baxçeyê konsolosxaneyê de), di dîrokê de bi navê ”Mala Wergêran” (Dragomanhuset) hatiye navandin. Ji ber ku di salên kevn de, di hin odeyên wê de çend wergêr jîyane ev mekana heta rojên îroyîn jî bi vî navî hatiye nasîn. Ji bona ku van rojên bihurî bi bîr bîne, vê enstîtûyê navê salnameya xwe jî daniye Dragomanen (wergêr) ku heta niha jî bi pergal derdikeve. Him navê avahiyê: ”Mala wergêran” (Dragomanhuset) û him jî navê salnameyê: ”Wergêr” (Dragomanen) sembolîk be jî xweşikî û nirxekî mezin tevî dîroka wergerê dike. Tiştekî balkêş jî ew e ku Swêdê ev erdê ku îro li Îstenbolê konsolosxane lê dimîne, berê erdê wergêrekî osmanî bi navê Alexsandre Ghika bûye. Koka etnîkî ya vî wergêrî arnawûd bûye.. Ev erd wek milkê kevntirîn tê hesibîn ku Swêdê li welatekî dereke ji xwe kirîye.[4]

1 T. Arne, *Europa upptäcker Ryssland*, 1944, rûp.162.

2 Tsarens resa, *Fredrikshamn tidning* ,7/11 1888.

3 *Dil Oğlanları ve Tercümanlar: Enfants de Langue et Drogmans.* Frederic Hitzel (Editör). Çev. Mehmet Sert, Yapı Kredi Yayınları, 1995.

4 Ulle Ehrensvärd, *Dragomanhuset och Svenska Forskningsinstitutet i Istanbul*, 1999.



www.arsivakurdi.org

### Werger

### Mafekî mirovî û qanûnî

Hejmara biyaniyan li Swêdê îro ji mîlyon û nîvekî zêdetir e. Ev koman ji 200 zêdetir zimanan û zaravayan li Swêdê dipeyîvin. Kurdî yek ji van e. Ji aliyê din ve pênc komên etnîkî hene ku bi sedsalan in li Swêdê dijîn, ew wek hindikahîyên neteweyî (nationella minoriteter) tên hesibandin û navandin. Mafên wan wek swêdîyan bi qanûnan hatine parastin. Ev hindikayî, kêmnetewe ji van koman pêk tên: cihû, romî, fînîyên–swêdî û meänkielî.[5] Welatekî wiha piçûk ku bi nifûsê xwe 9,5 mîlyon e çawa em dibînin ji bo 1,5 mîlyon mirov –ku alîyekî wan bîyanî û koçber in– re bûye stareke mezin.

Piştî salên 1960î nûnerên bi sedan komên etnîkî koçberî Swêdê kirine. Di salên 1970î de xizmetên wergerê bi rêya Bûroyên Biyaniyan (Invandrarbyrå) dihate dayîn. Polêsê Swêdê bona ku karên xwe ligel biyaniyan bimeşîne li bajarê Landskronayê Bûroya Wergerê vedike.[6] Ji salên 1960î vir de li Swêdê xizmetên wergerê tên dayîn. Angorî zêdebûna koçber û bîyanîyan hejmara wergêran jî zêde bûye.

Angorî îstatîstîkên nû îro 1000 wergêrên desthilatdar (auktoriserade tolk) û 6000 wergêrên kontaktan li Swêdê bi aktîvî kar dikin. Lê belê hejmara kesên wergêr ku navên wan di lîsteyên bûro û sazîyên wergerê de derbas dibin, hin jî zêdetir e, qasî 15000 kesan tê hesibîn. Mirov dikare bi rehetî bêje ku li vî welatê piçûk ordîyeke wergêran a wiha mezin heye ku îro wergera 250 ziman/zaravayên cihêreng dikin.

Di zimanê swêdî de ji bo wergêran gotina tolk û ji bo xizmete wergerê tolkservice tê bi kar anîn. Gotina tolka him tê wateya wergerandin û him jî tê wateya tê şirovekirinê. Wisa xûya dibe ku ev ji kokekê tên. Ji ber vê nêzîkayîyê li Swêdê em carinan rastî van gotinên watedar û manedar jî tên: ”Mafê mirovan yê ji bo wergerê ne pirseke şirovekirinê ye!” (Rätt till tolk är inte en tolkningsfråga!). Angorî vê zîhnîyetê wergera belaş û rêkûpêk di her rewşeke hewcedar de ji bo hemwelatîyan divê hebe û ev mafa divê neyê niqaşkirin. Divê civat û dewlet ji hemwelatîyên xwe re xizmetên wergerê peyda bike, ev kar, ne karê kesan e.[7]

5 Meänkieli gelek caran wek zaravayekî zimanê fînî tê nasîn ku ji aliyê kesên herêma Tornedalê li Swêdê dimînin, tê peyivîn. Lê belê ev zaravaya li Swêdê zêdetir wek zimanekî serbixwe tê hesibîn. Meänkieli dema ji hev cihê dibe (meän kieli), tê wateya “zimanê me”.

6 *Tolkförmedling–Kvalitet, registrering, tillsyn*, SOU 2004:15, rûp.98.

7 *Tillgång till tolk– En samhällsservice*, Integrationsverket, 1999.



www.arsivakurdi.org

Li Swêdê dema hemwelatiyek, kesek ne hakimî zimanê swêdî be yan jî zimanê swêdî nizanibe angorî qanûnên heyî dewlet divê jê re wergêr peyda bike û bide anînê. Ev mafê ”alîkarîya wergerê” (tolkhjälp) û ”xizmeta wergerê” (tolkservice) li Swêdê wek mafekî mirovî û demokratîk tê zanîn. Hemû mesrefan jî dewlet hildide ser milê xwe. Mirov dikare bêje ku ji aliyê zimên de jî dewletê dîsa xwe spartiye prensîpê wekheviyê û integritetê (mafê nedîtina heqaretê). Di qanûna birêvebirinê (1986:223), qanûna dadgehkirinê (1940:740), qanûna nexweşî û qenckirinê (1982:763) û qanûna xizmetên civakî de (2001:453) xal hene ku ji wergera zimanên din re îmkanê didin û rê vedikin. Di qanûnan de carcar ji bo hewcedarîya wergerê guhartin tên çêkirin. Wek mînak di hin qanûnan de bi cîhanîna hewcedarîya wergerê bi gotina ”dikare” (får) hin caran wiha sist hatiye îfadekirin. Lê belê paşê dêvla gotina ”dikare” peyveke ku hinekî sert û mecbûriyetekê nîşan dide, hatiye bi kar anîn, wek gotina ”divê” (bör). Ev guhartin û formulekirinên wiha watedar di derbarê mafê wergerê de hasasiyeta Swêdê baş nîşanî me dide. Wek mînak di qanûna bi birêvebirinê de wiha tê gotin: ”Kingê daîreya fermî bi kesekî re têkiliyê datîne ku bi zimanê swêdî nizane yan jî bi tehrekî cîddî ker û lal zîyandar be divê daîre di dema hewcedariyê de, wergêr bide anînê”.[1] Di lêgerînekê de wergera rêkûpêk wek berpirsîyarîya dewletê hatiye dîtin.[2] Lêgerîneke ku di derbarê xizmeta wergera tendûristiyê de hatiye amade kirin, dîyar dike ku bê ziman mirov nikare here tu cîhekî.[3] Werger îro herwisa jî li Swêdê wek dersekê, wek warekî lêgerînê û wek zanistiyekê (tolkkunskap) tê hesibîn.[4] Peymana Zimên (Språkkonvetionen) ku di sala 1982an di navbera welatên bakur de, Swêd, Norweç, Danîmarka û Fînlandîyayê de hatiye îmza kirin û di sala 1987an de derbasî pratîkê bûye, mafê hemû hemwelatîyan ên xizmetên wergerê parastiye. Pirsa mafên wergerê yên koçber, bîyanî û penaberan ku li welatên bakurê dimînin herwisa jî berî salan hatiye rojeva Konseya Wezîrên Bakur (Nordiska Ministerrådet).[5]

1 *Tolkförmedling –Kvalitet, registrering, tillsyn,* rûp.89.

2 *Tolkutbildning–Nya former för nya krav,* rûp.127.

3 *Utan språk vänder man sig ingenstans–Tolkservice i sjukvården. Kvalitetsrevision,* Hälso och sjukvårdsnämnden i Stockholm, 1998.

4 *Tolkkunskap,* Tolk och översättarinstitutet, 2002.

5 *Språkliga tjänster för invandrare i Sverige, Norge, Danmark och Finland,* Nordiska Ministerrådet, 1997.



www.arsivakurdi.org

### Lêgerînên fireh di derbarê wergerê de

Di vî warî de heta niha bi dehan lêgerîn û xebat hatine kirin. Dewletê hê di salên 1968–1972 an de bi lêgerînekê sêsalîn dest avîtiye vê pirsgirêkê.[6] Di nav wê rêze–lêgerînên bi navê "Lêgerînên dewletê yên giştî" (Statens Offentliga Utredningar, bi kurtî SOU tên nasîn) encamên du lêgerînên fireh wek du pirtûk hatin weşandin: "Bûroyên Wergerê" (Tolkförmedling, 2004)[7] û "Perwerdeya Wergêran" (Tolkutbildning, 2005).[8] Piştî weşandina van herdu lêgerînan rewşa wergêran li Swêdê gelek hat niqaşkirin. Lê belê vê carê hin pirsgirêkên din rû dan. Dewlet bi alîkarîya unîversiteyan û sazîyên din ligel navendên wergerê xebatên nû li dar xistin. Bi pêşengîya Unîversîteya Lundê di salên 2008–2011an de projeyeke çarsalîn bi navê "Projeya Wergerê" (Tolkprojektet) pêk hat. Vê projeyê û encamên wê li Swêdê deng da, bala berpirs û sazîyên dewletê yên din kişande ser rewşa werger û wergêran, encamên projeyê di çend raporan de cîh girtin.[9] Di nav van salan de hin pirsgirêk û dijwarî di branşa wergerê de derketin holê.[10]

### Sazî, dezgeh û aktorên wergerê

Bi perwerde û hilbijartina wergêrên desthilatdar re Sazîya Xizmetên Dadmendîyê, Birêvebirinê û Aboriyê (Kammarkollegiet) mijûl dibe. Ev sazîya li Swêdê yek ji wan sazîyên here kevn tê hesibîn ku bingeha wê digîhêje sala 1539an. Dîplomayên wergêrên desthilatdar (auktoriserade tolkar) ji aliyê vê saziyê de tê dayîn. Ji bo şaşîyek çênebe divê em li vir dîyar bikin ku heta sala 1993an saziyeke din Kommerskollegiumê ev kara dikir. Hin caran em di cîhên din de jî rastî navguhartin û di nav saziyan de dewrkirina berpirsiyariyên wiha tên.

---

6 *Invandrarutredningen 2. Tolkservice – språkkonvention*, SOU 1972:83.

7 *Tolkförmedling–Kvalitet, registrering, tillsyn*, SOU 2004:15.

8 *Tolkutbildning –Nya former för nya krav.* Betänkande –Utredningen om kontakttolkar, Statens offentliga utredningar, SOU 2005/37.

9 Eva Norström, Kristina Gustafsson och Ingrid Fioretos, *Tolkens roll och tolkningens betydelse för rättssäkerhet och integration,* 2011. Roger Orwén, *Utvärdering av Tolkprojektet –Ny forskning tar helhetsgrepp om tolkfältet i Sverige och skapar användbara förbättringsförslag*, 2012.

10 Yek ji van pirsgirêkan, sûka wergêran e. Kasim Savaş ku bi xwe jî wergêr e di lêgerîneke xwe de qala rewşa aborî ya wergêran dike ku piştî sala 1992an çawa guhiriye. Ew, bi çavekî aboriya sosyolojîk li pirsgirêkê dinêre. Ev nivîs nehatiye weşandin, kopîyake wê ji Kasim Savaş hatiye girtin ku li Stockholmê kar dike.



www.arsivakurdi.org

Di sala 1986an de di nav Unîversîteya Stockholmê de Enstîtûya Wergera Devkî û Wergera Nivîskî (Tolk– och översättarinstitutet) vebû.[1] Ev enstîtû zêdetir bi karê lêgerîn û perwerdeya wergêran mijûl dibe. Ji aliyê din ew alîkarîya ku dewlet hersal ji bo perwerdekirina wergêran dida dibistanan heta sala 2012 bi destê vê enstîtûyê dihate parve û belav kirin. Dewletê ev kara wek em ê li jêr jî bibînin paşê sparte saziyeke din.

Yek ji wan komeleyan ku bi destê wergêran saz bûye, Yekitîya Wergêrên Swêdê (Sveriges Tolkförbundet) e ku di sala 1975an de ava bûye. 20 beşên wê li seranserê Swêdê hene. Demeke dirêj sereketîya vê komeleyê wergêrekî kurd Alî Labrîz kiriye. Alî Labrîz di sala 1986an de Ji Kurdistana Îranê hatiye Swêdê. Wergera zimanê kurdî û farisî dike, bûroyeke wî ya wergerê jî heye. Di çend komên lêgerînên wergerê de cîh girtiye, herwisa jî çend salan bûye serekê Yekitîya Wergêrên Swedê (Sveriges Tolkförbundet). Ew bi xwe wergêrekî desthilatdar e, di warê wergera dadmendîyê û tendûristiyê de xwedî kompetensê ye.[2] Rêxistina bi navê Konseya Xizmetên Wergerê (Tolkservicerådet) ku di sala 1996an de saz bûye, ji bo başkirina branşa wergerê kar dike. Endamên wê ji buroyên wergerê pêk tên. Ne tenê li Swêdê, ligel welatên cînar li hemû bakurê mîna Norweç, Danîmarka û Fînlandyayê rewşa wergêran hê di sala 1997an de hatiye niqaşkirin.[3]

Nexweşxane, dibistan, dadgeh, polês, sazîyên kardîtinê û şaredarî hewcedarî bi mîlyonan karên wergerê ne. Branşa wergerê li Swêdê warekî fireh e ku gelek dezgeh û aktor bi aktîvî beşdarî karên wergerê dibin. Şîrketên mezin ku karên wergerê dikin wek Semantix Språk Centrum AB, Språkservice Sverige AB, Transvoice–Stockholms Tolkförmedling AB, Järva Tolk AB îro ev sûka wergêran xistine bin hikimê xwe.

Di sala 1992an piştî derketina destûra avakirina bûroyên wergêran ên şexsî, gelek bûroyên nû dest bi kar kirin. Niha 20 bûroyên wergerê yên şexsî li Swêdê hene. Hejmara sazîyên wergêran ku di nav şaredarîyan (beledîyan) de hebûn ji sedî daketin 40an. Di navbera bûroyên şaredariyê û yên şexsî de îro rekabeteke mezin heye. Hasilata wan ya salane di sala 2002an de wek mînak 400 mîlyon kronê swêdî bûye (yên şaredarîyan 190 mîlyon kron û yên şexsî 180 mîlyon).

1 Di zimanê swêdî de dema kesek ji zimanekî mijarekê bi devkî wergerîne zimanekî din gotina *tolk*, dema bi nivîsekî wergerîne zimanekî din, vê carê ji bo van kesan peyva *översättare* tê bi kar anîn. Lê belê di kurdî ji bo herduyan jî bi giştî gelek caran gotina wergêr tê gotin. Me jî di vê nivîsê de eger ne mecbûr bibin, zêdetir ev peyva hevbeş bi kar aniye.

2 ***Hallå där Ali*** Labriz, *Tidningen vision.* 29/8 2002.

3 *Språkliga tjänster för invandrare i Sverige, Norge, Danmark och Finland*, Nordiska ministerrådet, 1997.



www.arsivakurdi.org

Hin bûroyên wergerê bi destên kurdan saz bûne, xwediyê wan kurd in. Yek ji wan bûroyan Xizmeta Wergera Devkî û Wergera Nivîskî li Järvayê (Järva Tolk– och översättnings service AB) e ku di sala 1996an de saz bûye. Xwediyê wê kurdeke bi navê Remziye Înanç e, di sala 1982an de ji bajarê Dîyarbekirê hatiye Swêdê. Ev bûroya bi 220 zimanan, ligel bi hezaran wergêran salê 70 hezar perçe karên wergerê dike. Ji ber van kar û çalakîyên xwe Remziye Înanç wek keseke bîyanî di sala 2008an de ji destê qralê Swêdê, xelatek bi navê "Koçbera Salê" (Årets Nybyggare) wergirtiye.[4] Yek ji van buroyan jî Linguacom e, sereka vê jî jineke kurd bi navê Rahşan Kılıç e. Buroya bi navê Linguacom endama Konseya Xizmetên Wergerê (Tolkservicerådet).

### Salên destpêkê

Piştî salên 1965an kurd êdî li Swêdê komekê pêk tînin. Di destpêka 1970yî de hejmara kurdan zêde dibe. Di salên 1980–1990î de bi hezaran kurdan jı wan herêmên bêhizûr koçberî Swêdê dikin. Îro ji 50 hezarî zêdetir kurd li Swêdê dijîn.[5] Dema em dîroka kurdên Swêdê raçav dikin, em dibînin ku bi zêdebûna hejmara kurdan herwisa hejmara wergêran jî bilindtir bûye. Di sala 1968an de dewletê bi navê lêgerîna biyaniyan lêgerînek da amade kirin. Vê xebatê heta sala 1972 ajot. Di eynî sala de encamên vê projeyê yên di derbarê wergerê de wek raporekê hatin weşandin. Destpêkirin, domandin û weşandina encamên vê projeyê him ji bo hemû biyaniyan û bi taybetî jî bona kurdan gelek girîng bû.[6] Di van salan de hewcedariya xizmeta wergerê (Tolkservice) li her derê Swêdê xwe hîs û nîşan kir.

Karên wergerê bi rêya Bûroyên Biyaniyan pêk dihat. Di sala 1972an de bi tevayî 22 Bûroyên Biyaniyan li Swêdê hebûn. Cara yekem Bûroya Biyaniyan di sala 1968an de li bajarê Uppsalayê vedibe. Xanimeke bi navê Gunnel Mogård dibe sereka wê ku di van salan de wê gelek alîkariya kurdan kiriye.[7] Di sala 1971an de jî beşa wergêran di nav vê bûroyê de vedibe. Di destpêkê de di vê bûroyê de bi qasî 20 zimanan werger tê pêkanîne. Yek ji van zimanan jî kurdî ye. Ji bo ku Uppsala bajarê xwendekaran hatiye nasîn, gelek caran wergêr ji nav van xwendekaran

---

4 Qiraliyeta Swêdê (Sveriges Kungahuset) ev nûçeya di malpera xwe de weşand (Kungen belönade "Årets Nybyggare", 2008).

5 Rohat Alakom, *Kurdên Swêdê,* Serkland, 2006, rûp.150.

6 *Invandrarutredningen 2. Tolkservice – Språkkonvention,* SOU 1972:83.

7 Mogård–Kurdernas Mamma Gunnel, *Dagens Nyheter,* 13/11 1973.



www.arsivakurdi.org

dihatin hilbijartin. Yek ji wan jî Bedo Anter bû ku bi karê wergerê mijûl dibû. Dîroka wergera bi kurdî heta wan salan dirêj dibe.

Di salên destpêkê de kesên ku li Uppsalayê û Stockholmê wek wergêrên kurd kar kirine, ev kesan bûne: Cemal Alemdar, Omer Şêxmûs, Memo Yetkîn, Bedo Anter, Anter Anter, Silêman Anter.[1] Di salên din de hejmara wergêrên kurd her çûye zêde bûye. Di salên 1990î de wek mînak li bajarê Uppsalayê qasî nod wergêr kar kirine ku bi qasî çil ziman karibûne û yek ji wan kurdî bûye. Zimanê kurdî wek zimanên farisî, spanyolî, tirkî, fînî û erebî li bajarê Uppsalayê bûye yek ji wan zimanên wergerê (tolkspråk) yên mezin.[2]

Angorî qeydên fermî (resmî) yên sala 1992an hejmara wergêrên kurd li Swêdê wek li jêrê ne.[3]

| | |
|---|---|
| Wergêrên zaravayê kurmancî | 106 (20 jin) |
| Wergêrên zaravayê soranî | 98 (17 jin) |
| Wergêrên zaravayê feylî | 4 (1 jin ) |
| Wergêrên zaravayên nesinifkirî | 8 (19 jin) |
| Hemû | 246 (57 jin) |

Mirov dikarê bi rehetî bêje ku ev 40 salan zêdetir e ku li Swêdê wergera kurdî tê kirin. Di demên hewcedar de dema kurdan wergêr nedidîtin, ji bo ku karên xwe bi rêve bibin, vê carê ji xwe re wek mînak "wergêrên xizman" (släkt/tolk) yan jî "wergêrên hevalan" (vän/tolk) peyda dikirin.[4]

## Kurdi

## Yek ji wan zimanên wergerê

Li hemû bajarên Swêdê îro wergêrên kurd hene. Hejmara saetên ku li Swêdê bi 170 zimanan werger hatiye kirin, angorî lêgerînekê wek mînak ji bo sala 2009an di navbera 1,2 û 1,5 mîlyonan de tê hesibandinê. Yek ji wan "zimanan wergerê yên mezintirîn" (största tolkspråk) ku di sala 2010an de pê karên wergerê hatiye kirin, kurdî ye.[5] Kurdî ligel zimanên erebî, somalî, darî yek ji wan zimanan e ku zêdetirîn

1 Rohat Alakom, *Kurdên Swêdê,* rûp.173–174.

2 Karin Borevi / Ingvar Svanberg, *Uppsala som invandrarstad,* 1993, rûp.133.

3 *Tolkservice i Sverige,* Statens invandrarverk, 1992, rûp.71–78.

4 Sara Ghasemyani, *Socialtjänsten och kommunikation genom tolk,* C–uppsats, Göteborgs Universitet, Socionomprogrammet, Höstterminen 2008.

5 Eva Norström, Kristina Gustafsson, Ingrid Fioretos, *Tolken – En kulturell mellanhand. Tolkprojektet"* , 2011, Institutionen för kulturvetenskaper vid Lunds universitet, rûp.11.



www.arsivakurdi.org

di vê salê de pê werger hatiye kirin.[6] Her kurdek mafê xwe heye ku bi alîkarîya wergêrên kontaktan (rû bi rû) yan jî wergera bi rêya telefonê karê xwe yên wergerê bibe sêrî. Tenê kes bi xwe biryar dide wekî hewcedarîya wî/wê bi wergêr heye yan jî tune ye. Zimanê kurdî yek ji wan zimanên mezin e ku di bûroyên wergerê de pê werger tê kirin.

### Wergêrên desthilatdar (auktoriserade tolkar)

Wergêrên kurd di nav xwe de dibin du beşan. Yek ji van koman wergêrên desthilatdar in (auktoriserade tolk). Ew bi azmûn (îmtîhan) tên hilbijartin û piştî ku destûrê ji saziya bi navê Kammarkollegietê werdigrin wê demê êdî dikarin dest bi kar bikin. Hin ji wan xwediyê kompetensa taybetî ne, wek wergêrên dadmendîyê û wergêrên tendûristiyê. Hejmara wan, em ê li jêr jî bibînin qasî 41 kesan e. Di destpêkê de wek mînak di sala 1996an de 16 wergêrên kurd (11 soranî û 5 kurmancî) ên desthilatdar kar dikirin.[7] Di sala 1985an de ji bo wergêrên kurd, azmûna desthilatdariyê dest pê kiriye.[8] Angorî qeydên sala 2013an yên Kammarkollegiet vê gavê qasî 41 wergêrên kurd yên desthilatdar li Swêdê hene ku li seranserê Swêdê belav bûne. Wek mînak yek ji wan zimanên ku li Stockholmê di warê wergera desthilatdar de zêdetirîn (frekvent) hatine bi kar anîn, kurdî ye (zaravayê soranî) û bi vî zaravayî 9030 saetan werger hatiye kirin.[9] Hejmara wergêrên kurd ên desthilatdar angorî zaravayên ku dipeyivîn, wiha ye:

Wergêrên desthilatdar ên zaravayê soranî (sydkurdiska) ........................ 36
Wergêrên desthilatdar ên zaravayê kurmancî (nordkurdiska)................. 5
Hemû.......................................................................................................... 41

Li vir bi vekirî xuya dibe ku di navbera hejmara wergêrên herdu zaravayên kurdî de bênîsbetîyek heye. Ev yeka ji ku tê? Divê ev mijara bê lêgerîn. Di nav 30 wergêrên desthilatdar de ku wergera zimanê tirkî dikin, wek mînak 6 kes ji

6 *Utvärdering av Tolkprojektet*, 2011, rûp.6.
7 *Förteckning över auktoriserade tolkar 1996*, Kammarkollegiet, nordkurdiska: rûp. 24–25 û sydkurdiska: rûp.53–55.
8 Lena Almroth, Kurdiska tolkar på kurs: Vi behöver en gemensam terminologi, *Tolkningsperspektiv*, nr 3–4/1987.
9 *Tolkutbildning*, rûp.96.



www.arsivakurdi.org

wan kurd in. Ji ber ku tirkî baştir zanin ji xwe re karê wergera tirkî dikin û di nav qeydên wergêrên tirk de cîh girtine. Ev yeka bi dîtina min sedemên vê bênîsbetîya jorîn piçekî be jî ronî dike. Mimkûn e ku kurd di nav wergêrên zimanên din de jî (wek erebî û farisî) hebin.

Mirov ji van cîhên karên wergêrên kurd bi hêsanî derdixe ku kurd li kîjan deverên Swêdê çawa belav bûne. Kammarkollegiet wek rêxistineke navendî ji bo bilindkirina pisporî û kalîteya wergerê, li hemû Swêdê berpirsîyarîya kontrola (tillsynsansvar) nêzî 1000 wergêrên desthilatdar dike. Kammarkollegiet di wê dîtinê de ye ku heger wergêr perwerdeke baş nebînin û ew nebin xwediyê desthilatdariyê, wê demê bi taybetî jî emnîyeta dadmendîyê (rättssäkerhet) û emnîyeta tendûristiyê (vårdsäkerhet) dikeve nav xeter û telûkeke mezin.[1] Mamosteyê zimanê kurdî Reşo Zîlan ji sala 1986an vir de wek nirxdarê zimên (språkbedömare) û pisporê zimên (språkexpert) ligel Kammarkollegietê kar dike û di azmûnan de beşdar dibe.

| Paşnav | Nav | Devera kar |
|---|---|---|
| Abdulla | Almaz | Östergötlands län |
| Ahmad | Hevi | Stockholms län |
| Ali Amin | Taban | Västra Götalands län |
| Amin | Golbar | Värmlands län |
| Amin | Nazanin | Värmlands län |
| Balani | Sirwan | Stockholms län |
| Bazirgan | Sirwan | Dalarnas län |
| Biroson | Gulav | Västra Götalands län |
| Daban | Amanda | Västra Götalands län |
| Ghaderi | Fardin | Uppsala län |
| Gharanfoli | Aziz | Stockholms län |
| Haidari | Aiub | Västmanlands län |
| Hardi | Saman | Gävleborgs län |
| Isit Nestani | Hassan | Stockholms län |
| Kader | Zana | Stockholms län |
| Kader | Dana | Stockholms län |
| Kader | Said | Stockholms län |
| Kaled | Perez | Västra Götalands län |
| Karim | Ardalan | Örebro län |
| Karimi | Kaveh | Östergötlands län |
| Labriz | Ali | Stockholms län |
| Mariwani | Aziz | Stockholms län |
| Marof | Azad | Stockholms län |
| Meriwani | Goran | Västra Götalands län |
| Mohidin | Lauran | Uppsala län |
| Mohtadi | Mohamed | Uppsala län |
| Mohtadi | Omar | Södermanlands län |
| Osman | Ismail | Gävleborgs län |
| Rabati | Aram | Uppsala län |
| Rad | Azad | Uppsala län |
| Rebbati | Asi | Stockholms län |
| Revoniemi | Golzar | Västra Götalands län |
| Salih | Magda | Stockholms län |
| Sultantuze | Meryam | Stockholms län |
| Walee | Roshna | Västra Götalands län |
| Wehby | Sherko | Västra Götalands län |
| Aydogan | Mustafa | Stockholms län |
| Büyükkaya | Servan | Stockholms län |
| Kaya | Necip | Stockholms län |
| Umdi | Sait | Skåne län |
| Özer | Orhan | Uppsala län |

Lîsteya wergêrên kurd ên desthilatdar, 36 kesên pêşîn wergêrên soranî û 5 kesên dawî wergêrên kurmancî (Çavkanî: Kammarkollegiet)

Yek ji wan mijarên ku zêdetir li ser tê sekinîn jî tore (sed) û diristîya (redbarhet) wergêran e. Rêbera bi navê Toreya qenc a wergêran (God tolksed) de ew mijarên ku wergêr divê bidin ber çavan, yek bi yek hatine rêzkirin. Sazîya Xizmetên Dadmendîyê, Birêvebirinê û Aboriyê (Kammarkollegiet) ev rêbera amade kiriye. Li vir bi hûralî li ser mijarên wek bêalîbûn, rastgoyî û erka sirveşartinê tê sekinandin. Wek mînak di cîhekî de tê gotin ku her wergêrek dema dibîne ku

1 Nadine Millbourn, *Tolkmissar ett hot mot rättssäkerheten – Ett kunskapsbaserade dilemma*, Lunds universitet, Kriminologiprogrammet, Januari 2012.



Komeke wergêrên kurd li Sovyetê (salên 1980yî)

di heqê karekî wergerê de nayê, divê dest ji wî karî berde. Di cîhekî din de dîyar dibe ku di dema wergerê de lêzedekirin yan jî guhartina gotinên herdu alîyên ku eynî zimanî nizanin, ne karê wergêran e! Bona ku wergêr ji der gotinên axaftvanan dernekeve divê hertim ”Forma–ez/min” bi kar bîne, wek mînak ”Di destê min de kêr tune bû”, forma ”Ew dibêje ku di destê wî de kêr tune bûye” ne rast e. Wergêrên kurd gelek caran daxwazên xwe bi rêya medyayê tînin zimên û ji bo bilindkirina statûya wergerê dîtinên xwe pêşkêşî hev dikin yan jî dighînin berpirsê dewletê. Wergêrên qels û ne baş jî bi rêya van niqaşan, danûstandinan hêdî hêdî tên bêjingkirin.[2]

### Wergêrên kontaktan

Komeke mezin a wergêran jî heye ku bi swêdî jê re “wergêrên kontaktan” (kontakttolk) hatiye gotin. Belkî jî bona van wergêran ji wergêrên ku bi rêya telefonê dixebitin, cihê bikin navê wan wiha hatiye dayîn. Piranîya van wergêrên kurd ku rû bi rû wergerê dikin wek wergêrên daîreyên fermî (myndighetstolk) kar dikin.[3] Hej-

2 Säkrare med ny tolklag, *Arbetarbladet,* 7/1 2013 (hevpeyvîn ligel wergêrê kurd Îsmaîl Osman ku li bajarê Gävle dimîne).

3 *Tolkservice i Sverige,* Katalog, Statens invandrarverk, Norrköping, 1992.

www.arsivakurdi.org

mara wergêrên kontaktan qasî 200 kesan tê hesibîn. Ev koma mezin a wergêran ne wek yên desthilatdar (auktoriserade tolk) xwedîdîplome ne. Gelek ji wan diçin qursên wergerê. Ji bo perwerdekirina wergêrên kontaktan ji aliyê dibistanên bilind yên gelêrî (folkhögskola) û sazîyên hîndekariyê (studieförbund) ve qursên wergerê li Swêdê pêk tên. Dewlet hersal bi peretî alîkarîya van dezgehan dike. Alîkarîya ku van dezgehan ji dewletê wergirtiye wek mînak ji bo sala 2004an 14,9 mîlyon kron e.[1]

Qasî 15 dibistanên bilind yên gelêrî û çend sazîyên hîndekariyê wek ABFê hersal qursên wergerê vedikin.[2] 1/6 2012 vir de berpirsîyarîya perwerdekirina wergêrên kontaktan Daîreya Fermî Bona Dibistanên Bilind ên Pêşeyî (Myndigheten för yrkeshögskolan) hildaye ser xwe. Berê ev kara Enstîtûya Wergera Devkî û Wergera Nivîskî (Tolk– och översättarinstitutet) pêk dianî. Hukimeta Swêdê ji bo ku rewşa wergêrên kontaktan baş bizanibe, di navendekê de qeydkirina wan di sala 2012an spartiye Kammarkollegiet. Êdî ew berendamên ku perwerdeya bingehîn a wergerê dibînin, wek ”wergêrên perwerdebûyî ” (grundutbildad tolk) derbasî qeydan dibin. Di van qeydan de mirov agahîyên nasnameyî bi rehetî dikare bibîne, wek mînak werger jin e yan mêr e, kîjan zarava yan jî zimanan zane, adrês û nimra telefonê di van jî di van qeydan de hene. Ev perwerdegarî bi kêmanî bi rêya perwerdeya gelêrî 545 saetan dajo. Gelek kurd jî diçin van qursan û nîşana (titel) wergêr distînin.

### *Wergera bi telefonê (Telefontolkning)*


Hinek wergêrên kurd gelek caran bi rêya telefonê (telefontolk) kar dikin. Di hewcedarî û bûyerên lezane de hewcedarîya dezgeh û sazîyan bi van wergêran heye. Her kurdekî/ke ku cara pêşîn hatiye Swêdê, bêguman bîranîneke xwe ligel wergêran heye.

Di roja 11/1 1983an de dema ez bi xwe bi balafirê wek penaberekî hatim Swêdê cara pêşîn wergêrekî kurd bi rêya telefonê pêşwazî li min kir. Wî wergêrê kurd, gotinên min yeko yeko ji berpirsên fermî re, ji polêsê balafirgehê re wergerandin. Ev cara pêşîn bû ku min bi çavên xwe didît û bûme şahid wekî gotinên min çawa ji bo zimanekî bîyanî tên wergerandin.

1 *Tolkutbildning*, rûp.55.
2 *Tolkkunskap*, Tolk och översättarinstitutet, 2002, rûp.16.



www.arsivakurdi.org




Reklameke wergera kurdî bi telefonê
Ji aliyê Meclîsa Wîlayetê (Landsting) de amade bûye

### *Wergera hevdemî (simultantolk)*

Wergêrên kurd hin caran jî dema civîn, şahî û dadgehên giring de wergera hevdemî (simultantolk) dikin. Wek mînak di dadgeha şewata dîskoteka li bajarê Goteborgê de 6 wergêran wergera hevdemî kirine. Di sala 1998an de li bajarê Goteborgê şewateyek di dîskotekekê de derket û di encama vê bûyêr de 63 keç û xort can da, 8 kes ji wan jî kurd bûn. Dema di sala 2000î de dadgeha vê bûyerê dest pêkir, 36 wergeran gotinên di salona dadgehê de, wergerandin zimanên curbecur. 6 wergêrên kurd jî bi herdu zaravayên kurdî wergera hevdemî (simultantolk) kirin. Di vê wêneya jêrîn de jî xuya dibe ku li jora kabînên wan him ”kurmancî” hatiye nivîsîn him jî ”soranî”.

### *Perwerde, staj û pratîk*

Ji bo wergêrên kurd hin caran çalakîyên perwerdekariyê hatine kirin, wek mînak çend qursên hîndekariyê amade bûne. Yek ji wan kesên ku di karê perwerdekirina wergêrên kurd de beşdar bûye, mamaosteyê zimanê kurdî Reşo Zîlan e ku di nameyeke xwe de wiha dibêje: “Min cara pêşîn li Wiks Folkhögskolanê dest bi dersdanê

www.arsivakurdi.org




Sê wergêrên hevdemî (simultantolk) li ber kabîna xwe

kir. Bawer dikim 1979/80 bû. Berî min 1 yan jî 2 qurs li nîveka Swêdê, dîsan li Folkhögskolanekê hatibûn dayîn. Piştî ku min dest pê kir, êdî ez tenê bûm û me li van Folkhögskolan qurs dan: Wiks, Västerhaninge û Biskops–Arnö".[1] Yek ji van qursan di rojên 7/1 1987 –27/2 1987an de li Xwendegeha Bilind ya Gelêrî li Västerhaningê pêk hatiye. Di vê qursê de 16 kes beşdar bûne. Ev xwendekarên kurd di nav du mehan de rojê 8 saet bi qurseke gelek întensîv perwerde bûne.[2] Mamostetîya vê qursê Reşo Zîlan û Ferhad Şakelî kirine. Di navbera rojên 18/9 – 4/10 1987an de komek wergêrên kurd bi rêyên fermî ji bo pratîkê çûne Yekitîya Sovyetê. 20 wergêrên kurd tevî vê gera sê heftan bûne. Ev ger bi îmkan û hevkarîya Enstîtûya Wergera Devkî û Wergera Nivîskî ya Unîversiteya Stockholmê hatibû amadekirin. Çawa xuya dibe di sala 1987an de ji bo wergêrên kurd çend îmkan hatine pêşkêş kirin. Di salên 1992–1993 ji bo wergêrên kurd perwerdeyeke ji du termînan pêkhatî hate amade kirin. Ev perwerde wek projeyeke hevbeş, di navbera Unîversîteya Uppsalayê û Unîversîteya Stockholmê de pêk hat.[3] Di sala 2000an de 20 wergêr çûne Kurdistana Başûr, demekê li wir pratîka xwe çêkirine û zanîyarîyên

1 Mesaja Reşo Zîlan ya bi 4/3 2013 terîxî.

2 Lena Almroth, Kurdiska tolkar på kurs: Vi behöver en gemensam terminologi, *Tolkningsperspektiv*, nr 3–4/1987.

3 Angorî îfadeya bi telefonê ya wergêr Mistefa Aydogan (Yek ji wan xwendekaran ku tevî vê perwedegariyê bûye).



www.arsivakurdi.org

xwe pêşta birine.[4] Ne tenê kesên ku nû tên Swêdê, kesên ku bi salan li Swêdê mane di hin rewşan de ji bo ku xwe baş û rast bidin famkirinê hewcedarîya wan hertim bi wergêran heye. Ji ber vê yekê daxwazên di derbarê wergereke baştirîn hertim zêdetir dibin. Her wergêrek divê kurdî û swêdî baş bizanibe. Tenê zanîna van ziman-an jî têrê nake, divê bi piralî sîstema jîyana li Swêdê jî baş binase.



Wergêrên kurd di qursekê de

## Materyalên hîndekariyê

Heta niha ji bo wergêrên kurd çend materyalên hîndekariyê amade bûne. Di sala 1988an de ferhenga swêdî–kurdî ku ji 28 rûpelan pêkhatî ji bo termên tendûristiyê hatiye amade kirine.[5] Di navbera salên 1988 û 1992an de 41 wergêrên kurd li ser termên hiqûkî kar kirine û di dawiyê de ferhenga swêdî–kurdî ku ji 26 rûpelan pêk tê ji bo termên hiqûkî amade kirine.[6] Di sala 1994an de ferhenga di derbarê pîyaseya kar de hatiye weşandin.[7] Ev qursan bi alîkarîya Enstîtûya Wergera Devkî û Wergera Nivîskî û Dibistana Bilind ya bi navê Biskops–Arnöyê de hatine çêkirin.[8] Van hersê xebatan di van salan de valahîyeke mezin tijî kirin. Hewcedarîya materyalan ji bo

4 Intervju med Kaveh Karimi, *Stockholmstolken* nr 109/ 2001.
5 *Svensk–kurdisk basordlista i sjukvårdsterminologi,*1988.
6 *Svensk–kurdisk basordlista i juridiskstermino logi*, 1992.
7 *Svensk–kurdisk basordlista i arbetsmarknadsterminologi,* 1994.
8 Angorî Reşo Zîlan ferhengek di derbarê termên Wergeriya Civakî û Wergeriya Sîgortayê (Social–och försäkringstolkning) jî hatiye amade kirin, lê belê nehatiye weşandin, mesaja Reşo Zîlan ya bi 4/3 2013 terîxî.



www.arsivakurd.org

wergêrên kurd hertim di rojevê de ye. Wek mînak Enstîtûya Wergera Devkî û Wergera Nivîskî ku di nav Unîversîteya Stockholmê de cîh digre, di sala 2011an de Ferhenga Kurdî–Swêdî Ji Bo Wergêran (Ordlista för tolkar –Svenska kurdiska) weşand. Ev ferhenga ku ji 521 rûpelan pêkhatî ligel herdu lehçeyên kurdî yên mezin soranî û kurmancî amade bûye. Her rûpel bi pergala soranî–swêdî–kurmancî hatiye rêzkirin. Ev ferheng bi alîkarîya çend wergêrên kurd û lêkolerên swêdî amade bûye.

### *Wergera bi zaravayên kurdî*

Li Swêdê werger zêdetir bi van zaravayên kurdî tên kirin, kurmancî, soranî, badînanî û feylî. Kes yan jî dezgehên ku hewcedarî wergerê ne, angorî zaravayê ku dipeyîve ji daîreyên fermî wergêran daxwaz dike. Ji ber vê yekê di derbarê zaravayên kurdî berpirs û karmendên wergerê xwediyê agahî û zanyaran in. Divê ew van rastîyan bibînin û bizanin ku angorî vê jî gazî wergêrên rast bikin. Heger wisa nebe, werger pêk nayê. Di pratîkê de gelek caran şaşîyên wiha dibin. Ji ber van şaşfamkirinan, ev zaravayên zimanê kurdî di lîsteyên zimanên bîyanî de carina wek zimanên serbixwe tên nîşandan ku ev jî ne rast e û rêyê li ber tevliheviyan vedike. Di lêgerînekê de dîyar dibe ku di zaravayê kurmancî de kêmasîya wergera dadmendîyê tê kişandin û di vî warî de wergêrên desthilatdar kêm in.[1] Eynî çavkanî di derbarê wergera kurdî de qala hewcedarîya lêgerînan jî dike: ”Ne mumkin e wekî mirov bizanibe ka zaravayên kurdî çiqas hewcedarî wergêrên xwe ne, ev yeka divê mirov lê bikole”.[2] Ev rastîya nîşan dide ku divê di navbera wergêrên kurd de têkilî hin jî xurtir bibin. Konferanseke bi navê “Wergera kurdî li Swêdê– Duh–Îro–Sibê” dikare gelek pirsgirêkên wergêrên kurd derxe holê û çareser bike. Wergêrên kurd bi vî tehrî dikarin ji xwe re pêşerojekê jî tayîn bikin û dîroka xwe, bi xwe binivîsin. Rewşa xwe, îmkan û kadroyên xwe baştirîn ew bi xwe dizanin.

### *Wergera nivîskî*

Divê em li vira dîyar bikin ku hin sazîyên fermî û sazîyên din ji bo karên xwe gelek caran tekstên swêdî ji bo kurdan bi nivîskî werdigerînin kurdî. Bi vî tehrî şênîyên kurd ku li Swêdê dimînin dikarin di derbarê hin mijaran de bibin xwediyê agahî û zanyarîyên bikêrhatî. Alîyekî baş yê van wergeran heye ku ev tekstan li ser kaxizan dikarin ji bo pêşerojê bên arşîvkirin û parastin.

---

1 *Tolkutbildning –Nya former för nya krav,* rûp.108.

2 *Tolkutbildning,* rûp.228.

Di sala 1983an de "Saziya Biyaniyan a Dewletê" (Statens invandrarverk) bi navê "Projeya Jenny" xebateke înformasyonê bi zimanê kurdî bi cîh aniye. Ji bo vê projeyê komeke ku ji heyşt kesan (çar kurd, çar swêdî) pêkhatî saz bûye. Ji bo ku roja destpêkirina vê xebatê angorî "roja navan" (namnsdag) rastî navê Jenny hatiye, projeyê ev nav li xwe kiriye. Jenny navê jinan e û tê wateya (Xwedê hat merhemetê). Eger mirov ji van gotinên pîroz bi rê bikeve, mirov dibîne ku kurdî – vî zimanê bêdewlet – li Swêdê ji we re warekî jîyanê peyda kiriye. Nirxê vê projeya ku berî 30 salan pêkhatiye, gelek mezin e. Cara pêşîn hewcedariya wergera nivîskî bi kurdî derketiye pêş. Di nav du salan de hin materayal bi nivîskî kurdî derketine.[3] Wek mînak Reşo Zîlan[4] û Reşîd Simo[5] wek wergêr xebitîne. Sazî û dezgehên din jî di salên pêş de tekstên wiha weşandine.[6] Wergêrên karên nivîskî yên desthilatdar (auktoriserade translator) ku wergera kurdî û swêdî dikin kêm in. Yek ji wan kesan Mohammed Mohtadi ye ku tenê bi karên zaravayê soranî–swêdî mijûl dibe.

Bi îmkanên dewletê wek mînak heta niha çar ferhengên swêdî bi wergera kurdî derxistine. Yek bi zaravayê kurmancî di sala 1989an de ji aliyê Reşo Zîlan de[7] ya din di 2006an de ji aliyê Mistefa Aydogan, Mahmut Lewendî û Vîldan Tanrikulu de hatine wergerandin.[8] Di vê ferhenga dawî de 28 500 peyvan cih girtiye. Ev ferhengann herwisa jî bi zaravayê soranî derketine.[9] Mirov dikare bêje ku di van bîst salan de Projeya Lexinê çar ferhengên swêdî û kurdî weşandine.

Vê projeya mezin di dawiya salên 1969yî de dest pê kiriye û heta niha jî didome. Ev ferhengan di înternetê de jî hene. Bi saya van versîyonan mirov dikare swêdîya gotinan jî guhdar bike. Berpirsiyariya Projeya Lexinê ji sala 2008an vir de Konseya Zimên (Beşeke Enstîtûya Ziman û Hafiza Gelêrî) hildaye ser xwe.[10]

3 *Information på kurdiska*, Statens invandrarverk, 1986.

4 *Zarok û malbat li Swêdê*, Statens invandrarverk, wergêr: Reşo Zîlan,1984.

5 *Agahdariya Swêdê,* Statens invandrarverk, wergêr: Reşîd Simo,1991.

6 *Broşûra Nexweşan–Depresyon*, wergêr: Hesenê Metê, 2006. *Wergirtina tahlîla hucreyî ya jinekolojiyê*, wergêr: Hesenê Metê, 2012.

7 *Svensk–kurdiskt lexikon (Nordkurdiska)*, 1989, Statens institut för Läromedel. Översättning: Reşo Zîlan (Di sala 2000an de çapa duwem a vê ferhengê jî derketiye).

8 *Svensk–kurdiskt lexikon (Nordkurdiska)*, 2006, Myndigheten för skolutveckling. Översättning: Vildan Tanrikulu, Mustafa Aydoğan, Mahmut Lewendî.

9 *Svensk–kurdiskt lexikon (Sydkurdiska),* 2000, Statens skolverket. Översättning: Hassan Ghazi & Hewa Cardoi. *Svensk–kurdiskt lexikon (Sydkurdiska),* 2007. Myndigheten för skolutveckling. Översättning: Rebwar Rashed (Davodi).

10 Navê vê saziya zimên wiha ye: *Institutet för språk och folkminnen*. Gotina folkminnen ku di swêdî de bi wateya hafizaya gel hatiye bi kar anîn, herwisa jî tê wateya folklor (edebîyata devkî).

www.arsivakurdi.org

Gotina Lexin ji sê tîpên pêşîn yên peyva ferheng (lexikon) û du tîpên peyva biyanî (invandrare) pêk hatiye (Herwisa jî li navê din yê ferhengê binêre: Lexin–Språklexikon för invandrare). Hemû ev ferhengan bi dehan zimanan di çarçoveya Projeya Lexinê de bona biyaniyan wek rêze–ferheng hatine weşandin.

#### Encam

Zimanê kurdî wek tê zanîn li Tirkiyê bi salan wek zimanekî qedekirî û zincîrkirî hebûna xwe di nav mercên gelek nemirovî de berdewam kir. Hawar, qîrin û qîjîna vî zimanî di zîndanan de di salên 1980yî de digihîşte erş– ezmanan. Zordestîyên li ser zimanê kurdî bi hezaran bûn. Ji ber van êrişan gotinên girtîyan û nasên wan gelek caran di qirikên wan de diman. Ev peyvên kurdî yên zincîrkirî nikaribûn bi hemdî xwe di qirikên mirovan de biherikiyan yan jî bifirîyana derva. Ev felaketên ku li Tirkiyê hatine serê zimanê kurdî herwisa jî bûne mijarên çend berhemên edebî wek ”Ez nanekî bi tirkî dixwazim” (Cezmi Ersöz) û “*Zimanê çîyan*” (Harold Pinter)...

Serekê Şaredariya Amedê Mehtî Zana di sala 1987an de dema xwest ku li pêşberî dadgehê xwe bi kurdî biparêze, daxwazên web bîne zimîn wek tê zanîn, ew rastî gelek zordestiyan hatiye. Dagdehê bi zorê ew derxistiye derî salonê. Zana di van salan de teda û lêdanên mezin dîtine. Dema xwest ku vê berxwedana xwe bidomîne, hêzên fermî vê carê ew sirgûnî bajarê Eskişehirê kirine.[1]

Vê tecrûbeya wergera kurdî (devkî û nivîskî) ya çilsalî li Swêdê herwisa jî alîkarîya pêşketina zimên kiriye. Bi taybetî jî di nav van bîst salên dawî de wek mînak wergerandina çend ferhengan ji bo kurdî bi serê xwe bûyereke dîrokî ye. Ne tenê di warê wergerê de, di gelek warên din de jî çanda kurdî li Swêdê pêşta çûye. Swêdê heta niha polîtîkayeke comerd û (dest)vekirî li hemberî pêşketina zimanê kurdî meşandîye. Di nav van çil salan de statûya zimanê kurdî her çûye bilind bûye, kurdî “pere” kiriye, bûye zimanekî sûkê. Medya swêdî hin jî pêş de çûye û Stockholm wek “paytextê kurd” (kurdisk huvudstad) yê çandî bi nav kiriye.[2] Ji zarok û şagirtan re, mamoste, nivîskar û hemû hunermendên kurd re Swêdê hertim hembêza xwe vekiriye. Ji bo vê yekê heqê koma kurdên Swêdê heye ku vî welatê lê danîne, ji xwe re bikin hêlîn û welatê duyem. Heger em peyva wergêr bi wateyeke fireh wek metaforekê bi kar bînin, em bi rehetî dikarin bêjin ku di nav van çil salan de Swêd wek dewlet bi gelek îmkanên xwe, ji kurdan re, ji êşa wan a zimên re hertim bûye alîkar, hertim bûye “terciman!”

---

1 Ji notên axaftina bi telefonê ligel Mehdî Zana (17 /4 2013, Stockholm).

2 Lise Blomqvist, Stockholm kan bli kurdisk huvudstad, *Göteborgs Posten*, 11/ 3 1996.



www.arsivakurdi.org

# SOHBETÊN MAMÊ (3)

Mam Recall

**Bila çav pêvanedin ez qurban**

Dayîka min, (Hec Eyşo) bi eşqek mezin ji zarok, heywan û kulîlkan hez dike. Hetanî çendek sal berê, şibakên mala me, bi kulîlkên rengîn dihatîbûn xemilandin. Hemî kulîlk û heywanên me, (wek golik, berx, mirîşk, kuçik û pisik) bi navê zarokan, zarok jî bi navê heywan û kulîlkan nav dikir.

Li her îd û rojên bi taybet, em li gundê xwe (Qeregedîgê) dicivîyan…

Rojek ji wan rojan, hundirê mala me dîsa tijî zarok bû. Û dayîka min wiha bangî zarokan dikir: "*Lo lo mişko! Lê lê piskê! Nogina min, ax kuçiko*" hwd.

Û min jê pirsîbû:

Dayê, hebûna zarokan çima qebûl nakî û tu wan wek heywanan dihesibînî, ne guneh e?

–Bila çav pêvanedin ez qurban.

Çima, tu nabejî maşillah?

–Helbet dibêjim, him jî hezar carî dibêjim lê, dîsa jî ditirsim.

Ji bo çi ditirsî?

–Tirsa min; belkê maşilleh kêm verin û pênekin lawo.

Na na, ji bo çav pêvandinê qet netirse dayika min. Lê eger te însan û heywan tevlihevkir, hingê Xudê dê pir aciz bibe û were ziman. Û belkê azarî bide te û wiha te hişyar bike û bibê: ŞERME AYŞE SULTAAAN, ZOR ŞERME!

**Hevaltîya Beko û Sado**

Wê rojê Heco pêşwazîya min kiribû… Ya rastî; min û Heco me hevdu nasnedikir. Hevaleki ji Batmanê navnîşan û telefonê wî dayîbû min. Ji ber wê yekê, em bûyîbûn heval.

Piştî slav û xatir pirskirinê, em nezikî deh deqîqan li kolanek bajêr meşîyan. Dûv re, li derveyî Çayxaneyekê, em li ser du kursîkên piçûk runiştin. Heco, bi destê xwe li camê xist û nîşana du çayan dayîbû karkerê hundir.

Hevalê min, Ji hêlekê da halê min dipirsî û ji hêla din ve jî, titûn dipêçand. Û bi tilîyên xwe yên ziravik titûna Bitlîsê bi hunerek mezin ewqas baş dipêçand ku, mirov wek şaş û metel dikir.

Lê rewşa wî him pir jar, û him jî xemgîn xuyadikir…

Bi piranî, ez bi henekan dest bi axaftinên xwe dikim. Min dixwest disa wusa bikim. Û lewma çavên min li

www.arsivakurdi.org

tişteki balkeş, hişê min jî, li mijarek bi taybet digeriya. Paşê min dît ku; li ser cam û derîyê çayxanê tu nav xuya nakin û min ji hevalê xwe pirsîbû:

Heval, navî vê Çayxanê çiye lo?
– Kekê Mistefa, welleh ez jî nizanim. Naseki min, berî çendek rojan ev ciha nû vekir. Ez bawerim lewma hina bênav e.

Em dikarin naveki xweşik û bi taybet bidin vê çayxanê. Ji vira ha, bila navê vira bibe **Dîwana VIP**. Û pişti heneka min, rûyê heval hatîbû guhêrîn û em tevhev kenîyan. Lê disa jî, bêkêfîya Heco li ber çavan eyan bû.

Çay û cixarê êdî tama devê min kiribû wek jehr. Min dixwast, berê Heco dest bi sedema hatina min bike.

Mijara hevdudîtina me, li ser jîyana Beko bû…

Li gora têgihaştina min, Heco wek qet nedixwast behsa mirîna birayê xwe bike. Min jê pirsî:

Heval, eger tu naxwazî an jî vê gavê ne amede yî bila, neke xem. Em ê rojek din werin cem hevdu. Nabe?

–Na na, nabe. Bibaxşîne kekê!

Paşê, ji cixareya xwe nefesek kûr û dirêj kişand û wiha dest bi axaftina xwe kiribû:

“Wan salan êdî Batman, ne Batmana berê bû…

Cîranî, xizm û hevaltî hatibû terk kirin û ji birkirin.

Gelê Batmanê, bi hevdu re bûyîbûn wek neyar. Silav û rûmet dayîn jî, wek bi temamî hatibû qedexekirin.

Mirovatî wan rojan, li tax û kolanên Batmanê carinan bêpere, car caran jî, erzan erzan dihatibû firotin. Lê dîsa jî jîyan, gav bi gav û kulek kulek didomî.

Roj, roja înîyê bû. Esman, hêdî hedî tarî dibû û rojê jî, êdî rengê xwe diguhêrand..

Wê êvarê, şênî û qelebalixek li kolanên Batmanê xuya dikir. Gelê Kurd, ji bo dotira rojê xwe amede dikirin Roja NEWROZê.

Ji xeynî Xwêdê; kê û çawa bizanîbû ku; birayê min Beko li wê Newrozê were kuştin”

Disa bi destê xwe li camê xist û ji hundir du çayên din xwastin. Paşê wiha berdewamî axaftina xwe kirîbû:

“Beko, wê êvarê ji her tişteki bêhay, bi peyan vedigere mala xwe. Li quncî kolanê, hevalê xwe yî berê Sado Xoce dibîne. Sado, bi otomobîla xwe derbas dibe. Beko, di pê Sado wiha qîjîye:

“Lo bênamûsî bênamûsooo!“

Û paşê jî, wek herdem nifira xwe ya bi navûdeng anîye zimên û wiha dubare kirîye:

(Ey Ezraîlê Ezîz! Êdî were ez heyrana bejn û bala te. Were, berê dayika Sadullahî bênamûs, paşê jî dayika min li te xweş û helal be!)

Heval, li gora bihistina min wî kesî berî çendek salan ji bo sedemek nêzanîn, navê Beko dayîye hêzên Hîzbullah. Wan jî, Beko revandine û bist rojan binçavkirine.  Çi anîne serê Beko, ji hêla  tukesî da ne diyar e. Lê ya ku hatiye eşkerekirin, Beko xanîyê xwe firoştîye û bi wê yekê, canê xwe xelas kiriye. Ev gotinan rastin an ne?

"Erê kekê, hemî rastin. Beko û Sado (Bekir û Sadullah) hevalên hevdû bûn. Li kolanên Batmanê tevhev mezin bûn. Hevaltîya wan, heta bist salîye bi awayeki biratî berdewam kiribû. Êdî wext, wexta çûyîna leşkerîyê bû. Di heman salê da, me li biharê Sado, li payîzê jî, Beko oxir kiribû."

Sado, berê dihere Sêwasê, paşê jî dişînin sinorê rojhilata Kurdistanê. Rewş û xeberên wî, wek dilê Beko diherimandîye. Ji ber ku; êdî Sado jî ketibûye nav şerê qirêj û şerê biratîyê.

Beko, lewma bêdil diçûye Manîsê

Wan rojan, Beko bi birayê xwe Heco ra, wiha digotîye:

"Keko! Ezê herim. Eger dewletê, wek Sado ez şandim rojhilat yan jî Başûr, welle ezê birevim. Tukes nikare min bike  neyarê xwîşk û birayên min. Helbet li hemberî welatek bîyanî şerek biqewime, hingê xwîna min xweş û helal be. Ezê ji bo welatê xwe, ji dil û can şer bikim. Lê qet naxwazim bibim qetîlê (kujdar) gelê xwe."

Piştî wê axaftinê, di navbera herdû birayan da, bêdengîyek peyda dibe…

Heco, birayê xwe baş nasdikirîye. Demekê kûr kûr difikire û paşê jî, destê xwe diavêje ser milên Beko û wiha dibêje:

"Birayê min! Ez qurbana çavên te yên reşik! Helbet nebe dijmînê milletê xwe. Lê revê jî nîne bîra xwe. Rev, ne karê mirovên camêr e. Li kuderê dibi bila bibe. Herdem bi xwe ewle û zîrek bijî. Hingê tukes nikare te bixapîne. Eger rojekê, tu neçar mayî, destî xwe deyne ser dilê xwe û biryara xwe hingê bide, ne niha…

Xwêdê mezine lo! Belkê jî te bişînin bajareki din, wek Îstanbol yan jî Enqerê"

www.arsivakurdi.org

# Helbest

## Nizanim Çima

Xizan Şîlan

ez
li serma çolistanên gunehkar
berê xwe didim oxira felekê
bi êş û jana helbestan re
rêwitiya firtûneyên har dikim
çima
stêrka xewnên geş
bi mij û talaza heyamên reş
hatiye dagirtin
konê rojên bextewariyê
di tariya kendalên bêbinî de
hatiye vegirtin
çima
di dilovaniya wîjdanê xwe de
têm guvaştin
ava newalên temenê mesûm
miçiqîn
çima
rûyê albûma bîranînên şadiyê
zerikîn
hilma cixareya lêvên peritî
di gewriya min de
bû giloka xwîna cemidî
çima
çeqelên demê
gulsosinên baxê hezkirinê
çilmisandin
tîra bêbextiyê
di movikên pişta xûzbûyî de
daçikandin
kul û birînên xedar
di henasa min de
meyandin
û kindirê sêdarê
li stûyê giyanê min
alandin
çima
lezeta şereba kêfxweşiyê
li ser zimanê şîrîn
tehl û tirş dibe
hîqehîqa kenên şên
di qefesa min de
dixeniqin
çima
li ber çiraya awirên dilbera gerdenzêr
di kelecena dilê xwe de
dilerizim
agirê eşqa dilê serxweş
ez li nav kelem û striyên jiyanê
tarûmar kirim
çima
li nav qelebalixa heval û dostan
tenêtiyeke qambax
xwe li mêjiyê min



www.arsivakurdi.org

dipêçe
li seyrangeha biharên rengîn
di gavên sistûpist de
dişemitim
çima
di xewên şevedermayî de
axîn û nalînan dadiqurtînim
li van kolanên bajarê xerîb
hêviyên stewrbûyî
didoşim
çima
li şahiya dawet û dîlanan
têlên awaza tembûra min
qetiyan
keştiya êvarên rût
di kûrahiya deryaya nava min de
bêxwedî ma
êdî
pozê pênûsa min
di gilî û gazincên xwe de
xitimî
finda quncikê odeya bêdeng
vemirî
ez ê
li ber pêlên bayê hesretê
tevna qedera xwe ya serserî
bihûnim
hest û xeyalên westiyayî
di bin siya baskên ewran de
vehesînim

2014-01-24
Stockholm

# Gul û Kulîlk

Berfîn barîn bi tacikan,
gulan xwe dan ber malan,
nêzik nêzik di ber re çûm û hatim.
Berfîn rabûn, gul keniyan,
rihan reviyan, ketin paş dîwaran.

Berfîn reşandin li ser xaniyan,
sosinan hevdu kişandin hewşan,
xweşik xweşik lê geriyam.
Beybûn hatin, xwe dan ber deriyan,
berfîn westiyan, çav keniyan.

Berfîn dahatin ser sîvikan
binevş daketin bin hej û pejan
çavik çavik lê nêriyam.
Asmîn firiyan, xwe dan bin sîvikan,
simbil kom bûn, ketin balan.

Berfînan xwe berdan sûk û kolanan,
gotin îro *heştê adarê* ye bi jinan,
gavik gavik pê re meşiyam.
Qurnefîlan serî bi hêz lê dan,
gulbûkan def û erebanê ba dan.

Gul û kulîlk ji hev bûn,
xwandin navên hemûyan,
hezik hezik lê guhdarî mam.
Dan lêboriyan ji bo yên nebeşdar,
ev roj nûjen bû bi meş û şahiyan.

09.03.2014, A. Karabax

www.arsivakurdi.org

# Cehzû

Seyfi Doğan

Havîn bû. Ez î li bexcî Kemalî Malê Zaxê Xoca û di Dergaha Hesmanî Şêmli da, li qatî dudiyan runişti bûm. Şev nîvê şevê bû. Odê ku ez têda runiştî; pencerên xwe gelek fireh û li başur, rojava û li bakur mezedikirin. Ezî bi tenê bûm. Hesman û Kemal çubûn gund.

Ez ketibûm nav mal û hila. Ji xwe ve derbas bibûm. Ciqas wext derbas bûyê ezî nizani me.Wexte ku ez hatime xwe ku dengên kuçikên şivanan bi dengê zengilan ve ê biêndişe û tevlihev têne.

Ez, ji cîhê xwe rabûm. Min di pencere ra, li derve, doralîya dergahê nerîn lê min tu tişt nedî û vegeriyam cîhê xwe, ser minderê. Dengê totekê hat. Telefonê min lêket, min hilda ku bersiv bidim lê kesî ji li alîyê dinda bersiv neda û di dîsplay da numre veşartî dinivisand.

Min deng bihistîn. Xişa û xiş li nav darên badêman dihat. Ez dîsa çûm ber pencerê başur û deme kê nav daran temaşe kir lê min tiştek ferk nekir û vegeriyam û çaya xwe dem kir.

Dengê kuçikên şivanan û dengê zengilan biêndişê, herkî diçû zêda dibûn.

Dergaha Hesmenî Şêmlî yê, ji gund dûr û ê nezîkî newala pîrikê ye. Newalê pirîkê li navberê du çîyan da ye û newalakê kûr e. Bihara û havînan şivanan kerîyên xwe ji bo ku ji serma şevê biperêzên, li wir mexel dikirin. Newalê telda yê.

Pisîkek bi cêlê xwe ve li me zêda bûn. Her şev dihatin ber derî dergahê. Dayîkê postî xwe sipî û şîrîkî bû û cêlê postî xwe wek dayîkê bû.

Me jê re goşt û fîrîk dikirin û dikelandin.Me xwarin dida derve ber derî. Her şev, pisîk berê bi xwe dihat. Xwarin dixwar û dû re dicû û cêlê xwe dida dû xwe. Pisîkê, doralîyê xwe baş kontrol dikir bi şunda, bange cêlê dikir. Hîngê, cêle dihate ser qawê xwarinê . Pisîk û cêlê piştî xwarinê, ji nişkeve wenda dibûn û heta dora dinê rojê bi şev, demê xwarinê.

Çend rojan, ne pisîk ne jî cêlê xuya kir. Lê xwarina ku me, dîtana derve ber derî, dihatê xwarin. Deme ku min ew rewza ferk kir ku pisîkê û cêlê nayê ne, min xwe da bende, ji bo bizanim ci hal e.

Min nav û dengê pîrikê pir bihîstî ye. Li ser pirîkê gelek heqat hatine û



www.arsivakurdi.org

tên gotin. Ew pîrika yê ji wan gunden Kurmancan bûye.

Navê wê yek jî, pîrika merxwur bû. Qal dikirin; şivanekî ku kerîya pêz zivistanî li hevşoyê gomê kevn bi xwudî dikirî, rojekê wenda dibe. Dikin û nekin û bi rojan li şivên digerin lê nebînin. Wenda buna şivên, bi ser pîrikê dikirin. Bi manê ku şivan, nayî jî wî gundî bû, xwelkê baş hîn nekir ci hatû bû serê wî. Heneka jî digotin; ew ji ber zordarîya xwudîyê keriîyê pêz, wegerîyê gunde xwe.

Dîsa deng hatin. Ez rabûm û berve pencera başur gav heynan. Dema ku ez nezîkê pencere bûm, ji nişkave dawestiyam. Min dît ku li ser qawê ku me ji pisikan re xwarin dikirî, jinek û kecikekê xarve hatine ser û goştê mirişkê dixwune. Ez giran û giran bi berve dawiyê odê çum û xwe kira taldî şomînê.

Demek çu bi şunda, min dengê pêkên ku bi merdiwanêda hildikişin bihistên. Dengên pêkan, herdem nêzîk dibûn. Herkî dengên pêkan nêzik dibûn, ez di cîhê xwe da biçuk dibûm û bedene min bi erdêda tûnîskî. Ezî ku hîng diwêda bûm telefonê min lêkat. Min nekanî bersiv bidim.

Min cavên xwe hildan û li alîyê derî mezekir. Derî, nivî xwe yî ji camê bû. Li ber derî, jinaka bedew û cîvan ku di destî keçikea penç û şeş sali girtîyê yê dawestîye. Jinikê sewawi li xwe kiribû. Sirmê sewawî wek zêr dibirikîn û çavên min hildan.

Jinikê, li derî xist û kûr û kûr li min nêrî. Min derî venekir. Bi rastî, min bixwasta ku derî vekim jî, heza mina ku derî vekim nemebû. Kecikê, qet dengê xwe dernetêxist û melûl û melûl dor alîyê mezedikir. Jinikê, carak din li derî xist û ez ji dest û pîya da ketim.

Jinikê fehm kir ku ez derî venekim. Destên xwe avitin camê û cam kira du alîya û serê xwe di qulê re reda. Demeke hundirî odê temaşa kir bi şunda, li min mezekir û dest bi axaftinê xwe kir.

Jîyan cesaret e!

Ji aşqê û şad bûne matirsin!

Wek rebenan, li bin linga magerin!

Bi tirsên xwe ve, bi jîyanê xwe ve û raborîyên xwe ve werin rûhevdu!.

Bi revê, meriv jan û eşên xwe bi xwedî dike û di bin barên wanan da netişt dibe.

Însanên bi qurbanê hêrsên xwe bibe.

Serhildan û berxwedana bi mêjo û dil ê birumet in.

Tirs neqedar e!

Xwe ji tirsên xwe azad bikin!

Ji jîyanê matirsin!

tirsên we yê tama dûnê û jîyane tamsarkî bikin.

Ez lal bûm! Ez mat bûm! Ez felc bûm!



www.arsivakurdi.org

Jinikê axaftina xwe berdewamkir.

Salê min sêzdeh bûn! Ez keca bi kezî bûm! Ez delala malbetê bûm! Gulîyên min dadiketin navê piştê min û mina camên cenetê bi newalê piştê min da diherikîn. Ez xwanga penc kecika û car bira bûm. Malbatê me, bi serî min sond dixwar. Keçikên gundan, bi min navdikirin. Porê minî kej û cavên minê hişin bûn.

Min, ji zerîyê rojê û ji şîne ezman û avê hezdikir. Biharê dema ku baran dibarîç min xwe, pixas dikir û li nav avê baranê bazdida û dihilîstim.

Ez ê îro jî, hetima ber derî we û bermayayên pisikan dixwime.Way li minê. Xwelî bi seri.

Min fedî kir.

Hundirê min tenekê firah bû û tirsa min hendik şikeşt. Her penc hîsên min, giran û giran dihatin cîhên xwe. Min, mêla xwe baş da jinik û kecikê. Jinik wek loksakê vedikat. Dema ku deng dikir diranên we wêk yek hestirkan dibirîkin. Gulîyên xwe li ber şewkê lambê mina avê ceman ku li hivronî dibirikî, bûn. Dengê we aram û kûr. Cavên xwe, mina avê kanistankên zelal û hişin. Di wê rewza bi zehmet da, Armaitî heta bîre min. Armaîta ya comert û nefsbiçuk.

Rojakê! Ew roja qet nabûya! Wê rojê, ma roj sûva bihata. Ew roja di erdê kete. Ez û çend hevalên xwe yê keçik, em li derve, li ber malê cîranakî bi kît dihilîstin. Min dît ku erebeke hespan, li ber malê me dawestî. Min merak kir, lê min listîka xwe devjêberneda.

Gava kê bi şunda, birayê minî delalî ji min bi sal, li ser sokanê xuya kir û ku kêrekê di destê wî da ye. Min lîstika xwe dewestand û li birayê xwe temaşa kir. Birayê min, keta hundirî gomê ku li kelekê malê me û bi kaviraka çê ve vegeriya. Kavir, li ber malê serjêkir. Min tişt fehm nekir. Ez meşiyam mal û li ser rê xwanga minê ji min biçuktir di derîyê min re cax bû û got; tu dane mêr.

Saş bûm. Min meşa xwe berdewam kir û heta mal bi lez meşiyam. Min dîya xwe li ber derî malê dît û kira xore xor ketima hembêzê. Dîya min jî barand û got; qeder e!

Wayê ku ez dibim bihar bû. Ez li payîze kirime bûk. Bi pîranî dawet payîzî di dû xermana re dibûn. Xelk, wê demê dest fireh dibû.

Merê min ji gunde kî din bû.Yanê ez yad bûm. Ji malbatê, cîrana û hevalan dûr ketim.

Mêrê min, ne kem ne jî zêda, mina mêrên alîyê me bû. Qîmetê min dizanî. Li ser min zordarî nedikir. Lê nezan bû. Rewza ku ez tê da û hesreta min fêhm nekir.

Navê min tune bû. Kesî bi navî min banga min nedikir. Ez bûk bûm. Bûka malê Mistafayî Kadrî Hesî Elê.



www.arsivakurdi.org

Her roj hesrete min bilin dibû. Radigeriyam! Hewnîya min nedihat.

Zivistan bû. Min keca xwe, bi dizîkî, li terkîyê xwe sîwar kir û berê xwe berve gundi bavanê xwe kir. Berî ku seredanê bavanê xwe bikim, min bi Cercicî Hasê re xeber şandi bû ku ezê malê bavanê xwe ziyaretê bikim.

Wexta ku em ji mal derkatin berf hêdî û hêdi dibarî. Wexta ku em gehiştînî dawîya cîyayî Beşaxila, berfê kira dupi û firtine. Em demekê çûn, lê me rîya xwe şaş kir.

Rewşeke ku rêvîtîyê berdewam bikinî nemebû. Min hesp dawistand û me xwe di newaladê, da taltî zinarêkî. Berf herkî dicû şen dibarî. Min bervanga xwe derxist û li Kejê pêca û Kej kira hembêzê xwe.

Ki hîng jinikê axaftina xwe nekadandi bû, dengê derî herime hat û Pirik û Kecik ji nişkave wenda bûn.

Biharê, dema ku belekî dikeve erdê, şivanek jinikê û kecikê di newalada li ber zinarekî dibîne.

Min xewna xwe ji Hesmên û Kêmêl re qal nekir. Dilê min li min gir bû. Zanyarî û fikrên min pelixîn. Mejoyê min di cîhê xwe hilnehat û param parce bû.

## AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di ***Bîrnebûn***ê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin–mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

www.arsivakurdi.org

# ŞİKARİ METİNLERİ

Sedat Ulugana

Şikâri metinleri, Orta Anadolu Kürtlerinin tarihine dair en eski el yazması unvanına sahip bir kaynaktır. Metinler, Selçukluların Orta Anatolya'ya gelmesiyle başlayıp Osmanlı devletinin Orta Anatolya'yı almasıyla bitiyor. Bu 400 yıllık süreç içinde Kürtlerin önemli bir aktör olduğu görülüyor.

Kürtlüğü tartışılan, Dulkadir, Eşref, Germiyan gibi beyliklerin tarihine açıklık getiriyor. Sivas (Eretna) devletinin ise Kürt olduğunun haberini veriyor. Bunun dışında Kürtlerin Selçuklu, Karamanoğlu ve Moğollarla yapmış oldukları savaşları ve Konya, Ankara gibi şehirleri elde etmeleri hakkında da ayrıntılı bilgiler veriyor. Metinlerin tek nüshası vardır. Bu güne kadar üzerinde bilimsel bir çalışma yapılmamıştır. Metinlerin, cumhuriyetin ilk yıllarında Konya valisi olan, tarihçi Murat Bardakçı'nın dedesi Cemal Bardakçı tarafından Konya'ya getirildiği biliniyor. Cemal Bardakçı'nın, Konya'ya gelmeden önce Bitlis'te olduğu biliniyor. Şikâri, metinlerde Amidli (Diyarbakır) olduğunu söylüyor. Eserin Kürt illerinden birinden Konya'ya getirildiği muhtemeldir. Bazı kaynaklar nüshanın kayıp olduğunu söylese de nüsha, Konya Yusuf Ağa Camii Kütüphanesi'nde mevcuttur.

Bazı tezkireler asıl adının Ahmet bazıları da Haydar olduğunu söylüyor. Bu iki bilginin sonucu olarak asıl adının Ahmet haydar olduğu da ihtimaller arasındadır. Tezkirelerin verdiği bilgilere göre dedesinin ismi Acem Kasım Paşa; babasının ismi ise Amidli Mirliva Hasan'dır?

Kamus'ül–alam hal tercümesine göre Şikâri bir tarikata bağlanmış, derviş olup diyar diyar gezmiştir. Ama hayatı hakkında kesin bilgi yoktur. Ahmet ya da Haydar Şikari… 1506 ya da 1584'de ölmüş, Osmanlı yüksek bir görevlinin oğlu ve torunu ve Yusuf ile Züleyha öyküsünün eksik kalmış mesnevi tarzındaki yazarı; 1567 tarihli resmi kayıtlarda adı geçen Malkara kadısı ya da Birinci Ahmet döneminin önemsiz kadısı ve şairi Şikarî Çelebi

Bütün bu tespitlerin aksine yine de metinlerin yazarı Şikarî'nin hayatı için kesin bir şey söylenemiyor. Aslında Şikari diye bir zatın gerçekten var olup olmadığı da kuşkuludur. Metinlerin

www.arsivakurdi.org

yazılış tarihi, Cem Sultan'ın Konya'ya kaçıp, Karamanoğulları'na sığındığı döneme denk gelir. Dönemin Konya sarayının gözde şairi Şerif–i Amîdî'dir (Diyarbakırlı Şerif). Cem Sultan ile dost olan Şerîf, dolaysıyla Osmanlı sansürüne takılır. Örneğin şiirleri tezkirelerde bulunmaz. Bana göre Şerîf–i Amîdî sırf sansürden kurtulmak için, Şîkarî mahlasını kullanmaya başlar ki, Konya'da mevcut mecmuaların çoğunda perakende bir şekilde Şîkarî mahlasıyla yazılmış gazeller mevcuttur. Yani Şîkarî metinlerinin asıl yazarının Şerîf–i Amîdî olması da muhtemeldir.

Şikari metinleri üzerine yerli ve yabancı birçok tarihçinin tespitleri mevcut olduğu halde, yeteri kadar açıklayıcı bilgi edinilmemiştir. Örneğin Paul Witek, metinleri değersiz bulur. Claude Cahen ise, Şikari metinlerinin objektifliğinden kuşkulanır.

Metinlerin dili eski Anadolu Türkçesi olup, satırlar arasında Farsça sözcükler çokça kullanılmıştır. İki ağıt ise sadece Farsçadır. Bu hususlar, Şikâri'nin çok dilli bir edip olduğunu gösteriyor. Metinlerin bazı varakları rutubet kapmıştır. Bu metinlerin söz başları ve durakları kırmızı renklidir. Metinlerin çoğunda Kürtlerden bahsediliyor. Bu elyazmasının 1940lı yıllarda Konya Müzesi müdürü Mesud Koman tarafından bir tıpkıbasımı




yapılmış fakat Kürtlere dair bölümler çarpıtılarak ya da atlanarak çoğunlukla verilmemiştir. Elyazmasının Kürtlerle ilgili bütün bölümleri tarafımdan günümüz Türkçesine çevrildi. Selçuklu ve Karamanoğulları'na dair Türk resmi tarih öğretisini deyim yerindeyse yerle bir eden bu eserle birlikte Kürtlerin Anatolya tarihindeki rolü ve yeri iyice belirginleşiyor. Söz konusu çalışma geçen aylarda Do Yayınevi yayınları arasında çıktı.

Şikari Metinleri, devletin resmi tarihinin aksine, Anadolu'daki Kürt ordularının varlığına işaret eder. Anadolu'yu defalarca işgal eden Haçlı Ordularıyla sadece Türkler mi savaştı?

Hayır!

Antalya önlerinde Haçlıları yenen Selçuklu ordusunda on bini aşkın Kürt savaşçı vardı. Aynı savaşçılar, Ankara, Niğde ve daha nice Anadolu diyarını fetheden Selçuklu ve Karamanoğlu Beyliği ordularının içinde de yer aldılar.

Konya'yı yine aynı savaşçılar zapt edip iki yıl ellerinde tuttular. Yetmedi, kuruluşunun başlangıcında Osmanlıları mağlup ettiler. Bu savaşlarda, İbni Kürt(Kürdoğlu), isimsiz bir Kürt komutan olarak karşımıza çıkar.

**Kimdir İbni Kürt?**

Metinlerden anlaşıldığı kadarıyla Sivas'ın Kürt beylerindendir. Eğer, önümüzdeki zaman diliminde 12. yüzyıl Anadolusuna dair kapsamlı ve tarafsız araştırmalar yapılırsa, Kürt ordularının Anadolu'daki yeri belirginleşeceği gibi, isimsiz Kürt komutan İbni Kürd'ün de gerçek ismini öğreniriz .

**Metinlerden bir pasaj:**

*"Konya'da o zamanlar sözü dinlenen iki fesat şahıs vardı… Ahi Nahis ile Ahi Murat. Halk birine Cebbar Kethüda diğerine de Pazarcıbaşı derdi. Bir gün halkı etraflarına toplayıp; "eğer Karamanoğlu Alâeddin şehrimizde kalırsa halimiz kötü olur. Ondan kurtulmalıyız." diye. Bunun üzerine şehir ahalisi, Eretnaoğlu Mehmet'e gidip: "Karamanoğlu kötü huyludur. Lakin biz seni sevdik. Sen bu şehri şah Alâeddin'den iste… Bize bey ol, biz seni çok sevdik." dediler. Bunun üzerine Mehmet Bey, Konya'yı Şah Alâeddin'den istedi.Alâeddin de, "bütün şehirlerim senindir. Ama bilirsin ki kardeşim Davut Konya beyidir. Onu buradan başka bir yere göndermem biraz zordur. Onun için şehri ikinize veriyorum. İkiniz de Konya beyisiniz bundan sonra." der. Bu iki Ahi fesat bunun üzerine, Şah Alâeddin'in kardeşinin ağzından bir mektup yazıp Alâeddin'e gönderdiler: "Gözüm nuru şah, hemen askerlerini alıp bir saat bile durmadan Larende'ye gelesin." Bunun üzerine Alâeddin askerlerini toplayıp Larende'ye gittiler. Bunu fırsat bilen Ahiler Kürd askerlerine haber vererek: "tez gelin, Alâeddin askerini alıp gitti." diye. Hemen yola çıkan 16 bin Kürd askeri Konya'ya geldi. Rivayete göre o gün Davut Bey ile Mehmet Bey, 17 bey ile sohbet etmekteydi. Birden sesler geldi. Ne oldu diye dışarı çıkıp baktıklarında, şehir ahalisi kapıyı Kürd askerine açtı. Kürdler, Keykubat sarayını sardılar. Önüne çıkan her askeri kılıçtan geçirdiler. Mehmet Bey ile Davut Bey can derdine düştü. Davut Bey bir ata binip Larende'ye, Mehmet Bey de bir su kanalına atlayarak şehrin dışına çıkıp bir ata binerek Sivas'a doğru yola çıktı. Kürd kavmi kılıçlarını çekip Halil soyundan 24 şehzadeyi katlettiler. Konya'yı zapt ettiler. Rivayete göre Mehmet Bey bir abdal kılığına girip Sivas'a geldi. Bir hana yerleşti."*

www.arsivakurdi.org

# Germiyan Beyliği

*Anadolu Kürtleri´nin tarihi son 15-20 yıl boyunca tartışma ve araştırma konusudur. Bu konuda şimdiye kadar yapılan çalışmaları daha çok bilgi-kaynak toplama, derleme ve yayınlama olarak adlandırmak mümkündür. Akademik boyutlu çalışmaların gerekli olduğunu belirtmek yerinde olur. Pek çok yerli ve yabancı kaynak, Germiyan Beyligî`nin Selçuklu ve Osmanlı´nin ilk döneminde, Ege Bölgesi´nin en güçlü Beyliği olduğuna işaret etmektedir. Yine aynı kaynaklar, bu beyliğin bir Kürt Beyliği ya da Kürt ve Türkmen karışımı bir beylik olduğunu belirtmektedir. Aşağıda, www.akademiktarih.com 'dan (Akademik Tarih-2005 Hatıra sayısı) alınan yazı Germiyan Beyliği´nin güçlü konumuna işaret eden bilgileri içermektedir.*

***Germiyan*** *Kürtçe "sıcak" anlamına gelen* ***germ*** *sözcüğünden, yine Kürtçedeki çoğul üretme takısı* ***-yan*** *ile türetilmiştir. "Ilıcalar" anlamına gelir.*

**Bîrnebûn**

# Osmanlı Beyliği başlangıçta başka bir beyliğe bağlı oldu mu?

Yılmaz İzmirlier

Osmanlı tarihi veya iktisat tarihi ile ilgilenen herkes bu soruya „Evet ilhanlıların vasalı oldular ve onlara yıllık vergi ödediler" diyecekler. Fakat bazı paralar, onların bir dönem başka bir devlete de bağlı olduğunu düşündüren verilere sahip.

Osmanlı Beyi I.Murat'ın mangırları Sayın N.Kabaklarlı tarafından detaylı olarak tasnif edilmiştir. Burada II.tip olarak yer alan mangır çok önemli bir özelliğe sahip olduğu halde, bugüne kadar Osmanlı Paralarıyla ilgili yayınladıkları kataloglarda İsmail Galib, Halil Ethem, İbrahim Artuk ve Nuri Pere bu paraya uygun bir açıklama getirmemişlerdir, 1 nolu paranın bir yüzünde iki sıra halinde Murad bin Orhan / halledallahu mülkehu ibareleri yer alır. Diğer yüzünde ise yine iki satır halinde El sultan laa / halledallahu mülkehu yazışını görüyoruz.



No:1

www.arsivakurdi.org

Nuri Pere[2] bu yüzdeki yazılar için şu açıklamada bulunuyor: „Osmanlı paralarında ilk defa „sultan" **unvanı** 9 numarada kayıtlı bakır sikkede görülmüştür. Bu sikkenin arkasındaki birinci satır (Es-sultan-ül-adil) veya (Es-sultan-ül-alim) gibi okunabilir ise de (Es-sultan-ül-galib) okunmasının daha uygun olacağı Halil Ethem'in (Meskukatı Osmaniye) sinde belirtilmiştir." Bu satırlardan da anlaşılacağı üzere, bu parayla ilgili kafalar hayli karışıktır.

Osmanlı devletinde, tüm paralarında sultan unvanı, II.Mehmet tarafından 2.culüsunda kullanılmıştır. Bu da I.Murat'tan yaklaşık 80 yıl sonraya rastlar. Bu arada Çelebi Mehmed'in iki tip parasında ‚sultan' unvanına rastlıyoruz.

Murat mangırının ön yüzündeki „halledallahu mülkehu" Murat için bir temennidir. Arka yüzdeki „halledallahu mülkehu" kimin için söylenmiştir. Osmanlı dahil hiçbir batı Anadolu beyliği Hicri 8.yüzyılda, ‚sultan' unvanını kendi adları basında direkt olarak kullanamamışlardır. Sadece İlhanlı ve Germiyan adına bastıkları paralarda bu unvanı kullanmışlardır. I.Murat bu unvanı kendi için kullansaydı „Sultan Murat bin Orhan" şeklinde unvanı, kendi adı başına koyması gerekirdi. Böyle yapmamış, arkaya koymuştur, çünkü o yüz kendisine ait değildir. Bu paradaki birinci yüz Osmanlı Beyliğine, diğer yüz ise başka bir beyliğe, Germiyanoğullarına aittir. Yani genel deyişle bu para, vasal (bağımlı) olduğu devlet adına basılmış bir para olmalıdır. Germiyanoğulları hakkında biraz tarihi bilgi vermek gerekirse; „.....Germiyanlılar bundan sonra Batı Anadolu'da en kuvvetli beylik haline gelmeye başlamıştır. Batı Anadolu'daki Aydın, Menteşe, Saruhan ve Ladik (Denizli) beyleri (İnançoğulları) ilk zamanlarda Germiyan-oğullarına tabi idiler."[3] Aydın Beyliğiyle ilgili bir kitapta ise şu bilgilere yer verilmiştir; „İşte, XIV. yüzyılın başlarında Batı Anadolu'da teşekkül eden Aydın Oğulları, Saruhan Oğulları, Karasi Oğulları ve İnanç Oğulları beyliklerinin kurucuları Germiyan'a tabi beylerden idiler......""[4]Menteşe Beyliği adlı önemli eserinde Paul Wittek'de[5] bu konuda şu bilgileri vermiştir; „En başta zikredilen Karmanos Alisurios, Alişir hanedanından olup Germiyan beyidir.

Bir Arapça membaa göre bu beylik garbi Anadolu beyliklerinin iptidalarında bunların arasında bir hegemonya mevkiine sahip oldu." İsmail Hakkı Uzunçarşılı'da[6] Anadolu Beylikleri adlı başvuru kitabının muhtelif yerlerinde bu konuya değinmektedir.

Görüldüğü gibi Germiyanoğullan hicri 8. yüzyılda komşu beyliklerin birçoğu üzerinde hakimiyet kurmuştur.



www.arsivakurdi.org

Fakat hiçbir kaynakta Osmanlıların da Germiyan'a tabii olduğu hakkında bir kayıt yoktur. Buna rağmen yukarıda ki para I.Murat zamanında Osmanlıların bir süre Germiyanoğullarına bağlı olduğunu göstermektedir.

Germiyanoğullan soy kütüğünde[7] en üstte aile adı olarak Alişir görülmekte, onun altında Muzafferüddin Alişir ve onun altında da Kerimüddin Alişir yer alıyor. Alişir soy adı üç nesil kullanılmış. Alişir'in adına, Ankara'daki H.699 tarihli Kızıl Bey Camii minberinde rastlıyoruz. Burada „Yakub bin Alişir“ olarak geçiyor. Yakub Beyin babası olarak aile adı kullanılmış. Bu olaya beyliklerde sıkça rastlıyoruz. Alişir adının yazıldığı, bildiğim yegane para (gümüş) aşağıda 2 no.da verilmiştir.



No:2

Paranın alt satırında görüldüğü gibi „(E)l Aaliş“ şeklinde eksik bir imla ile yazılmış. Burada gördüğümüz „lam ayın elif“ den oluşan harfler Germiyan beyliğinin bir nevi rumuzu olmuş ve bazı komşu beyliklerin genellikle bakır paralarında kullanılmıştır. 3 no.lu Aydınoğlu bakırının bir yüzüne, 4 no.lunun ise iki yüzüne Germiyan rumuzu kazınmış.



No:3



No:4

5 ve 6 no.lu anonim paralar önceki yayınlarda Saruhanoğullarına[8] ve Aydınoğullarına“ verilmiştir.



No: 5



No:6

www.arsivakif.org




Bu paraların her iki yüzünde de „lam ayın elif Germiyan rumuzu kullanılmıştır. Fakat bir yüzünde I.Murat'ın bakırında ki yazının birebir aynısı yer almaktadır; iki satır halinde „El sultan laa / halledallahu mülkehu" ki, bir tek bu para dahi I.Murat'ın bakırının bir yüzünün Germiyan beyliği için basıldığını gösterir. Çünkü iki beylik, paralarında anlamı olmayan harfler ve kullanmamaları gereken ‚sultan' unvanlı aynı ibareyi kullanıyorlar. Verdiğim örneklerde bu rumuz bazen tek basma, bazen de ‚sultan' unvanıyla beraber kullanılmıştır.

Osmanlı Beyliğinde bu rumuzu yalnız I.Murat'ın bir tip bakırında görüyoruz. Aydın paralannın 8.yüzyıl 2. yarısına ait bakırlannın bazılarının bir veya nadiren iki yüzünde, yalnız rumuz bulunuyor. Saruhan'a atfedilen paraların yine hicri 8.yüzyıl ikinci yarısı bakırlannın birçoğunda her iki yüzde ‚sultan' unvanıyla beraber kullanılmış. Bu saptamaları yapıyorum, çünkü bunlar bağımlılığın büyüklüğünü ve zamanını belirleyen göstergeler olabilir.

Bu yeni gelişme birçok kimseyi, bilhassa tarihçileri çok rahatsız edecek niteliktedir. Fakat olay nümismatik yönden irdelendiğinde, tespitlerin sağlamlığı nedeniyle sonuçtan kaçınmak olanaksızdır. Buraya kadar her şey normal görünmekle birlikte, tarih kaynaklarında geniş bir şekilde anlatılan bir evlilik olayı, yukarıda bağımlılıkla ilgili verilen bilgileri zayıflatır niteliktedir.

Germiyan Beyi Süleyman Şah bin Mehmet'in kızı ile Osmanlı Beyi I.Murat'ın oğlu Bayezit'in (Yıldırım)

www.arsivakurdi.org

evlenmeleri. Bu düğün töreni devrin tarihlerinde „kız isteme, düğün alayları, düğün törenleri, cihaz olarak verilen yerler" gibi çok detaylı olarak anlatılmıştır. Bu evlenmeyi, siyasetleri gereği her iki hükümdar da istemiştir. Gelinin çeyizi olarak Osmanlılara verilen yerler de, şu şehirler olarak gösterilmiştir; Kütahya, Simav, Eğrigöz (Emet) ve Tavşanlı. Fakat Mükrimin Halil Yınanç Kütahya'nın verilemeyeceği kanaatindedir. Hakikaten de Germiyan Beyleri, daha sonraki tarihlerde Kütahya (Germiyan)'da çok çeşitli paralar darp etmişlerdir.

Nümismatik eski bakış açısından I.Murat'ın yukarıda ki mangırı bağımlılık ifade etmektedir. Fakat tarih açısından bakılınca, ilişkileri akrabalık bağıyla pekişen bu hükümdarların, bu paraları dostluk adına, akrabalık adına bastıkları düşüncesi akla yakın gelmektedir. Bu paralar, genellikle I.Murat'ın diğer mangırlarına nazaran, eksiksiz imla ve çok kaliteli hat içeren düzgün darplı paralardır. Muhtemelen gümüş akçeleri hazırlayan hakkaklar bu paraların kalıbını yaptılar veya Germiyan hakkakları bu kalıp için çalıştılar.

İslam ve Türk Nümismatiğinde artık «Hatıra parası» , «Dostluk parası», «Propaganda parası» veya diğer para tiplerinin konuşulmasına alışmalı ve bu bilim dalına hayal edebildiğimiz en geniş bakış açısıyla yaklaşmalıyız, diye düşünüyorum.

KAYNAKLAR:

1) Kabaklarlı, Necdet; Mangır, Uşaklılar Eğitim ve Kültür Vakfı Yayınları No.l, istanbul, 1988, s.66-75.

2) Pere, Nuri; Osmanlılarda Madeni Paralar, İstanbul, 1968, s.51.

3) Varlık, Dr. Mustafa Çetin; Germiyan-oğulları Tarihi, Ankara, 1974, s.24-25.

4) Akın, Dr. Himmet; Aydınoğulları tarihi hakkında bir araştırma, Ankara, 1968, s.6.

5) Wittek, Paul; Menteşe Beyliği, TTK Basımevi, Ankara, 1986, s.l8.

6) Uzunçarşılı, İsmail, Hakkı; Anadolu Beylikleri ve Akkoyunlu, Karakoyunlu Devletleri, Ankara, 1988.

7) Varlık, aynı eser, s. 155.

8) Ender, Celil: Karesi, Saruhan, Aydın ve Menteşe Beylikleri paraları, istanbul, 2000, s.71-75.

9) Ölçer, Cüneyt: Aydınoğulları Beyliği paraları, istanbul, 1985.

www.arsivakurdi.org

# NIRXANDIN

Sêfoyê Asê

Kitêba Nuhî Hecî Malê Herşîd ê bi navê ***Ehmedê Elê*** ji alîyê Capxana Apec da hatîyê weşandin. Ez dizwazim bi xwedîyê Apecê Elî Ciftcî re bibejim mala te ava be. Elî va nezîkî sîh sala ne ku ji her alîyê da xizmete kurdan, bi nefscukîyêke bi esalat dike. Bi teybetî jî bi rîya kulturê.

Kîtêb, tev da 160 rûpel û du beş in. Beşek, behsa rêwitîya jîyanê Ehmedê Elê dike û di beşa dudîyan da, nivîskar ji bo ku wênêkî jîyana Ehmedê Elê, bêkêmanî bide, ew ji kar û barê komela ku Ehmed Elê tê da aktiv kar kirîye, xwendewanan agahdar dike.

Kîtêb bi terzê biografî û hevpêyvînê ve hatîyê nivisandin. Lê niviskar, car caran enformasyon dide xwandivanan ji bo ku navarok baş were fêhm kirin.

Wek min li jor jî nivisand, kitêb behsa Jîyanê Ehmed Elê dike. Niviskar, kîtêba xwe wisa dida naskirin.*"Jîyana Ehemedê Elê tijî serpehatêyên nadir, balkêş û watedar e. Ji ber vê nivisandina jînenîgarîya wî ji min va, bo edebiyata kurdên Anatolîyayê ya mijara Kocberiyê jî, pêwist û lêhatî xuya kir"*


Ehmedê Elê jîyana wî bi dezavantajê dest pêkirîyê û bi salan dewam dike û hîn ji berdwam e. Lê Ehemedê Elê însanekî îsyankar e. Îsyankarêkî bi aqil. Ew qedr û kîymetê sebirê dizane. Ew, dizane ku dawîyê sebirê mikafat e.

Ehmedê Elê, dixwaze navê keca xwe bi Merwanî ke. Lê Konsoloslixana tirka, wî navî qebûl nake. Ehmed, ji yê xwe name û liberxwe dide. Li dawîyê konsoloslixana tirka Merwanî qebûl nake lê navê kî nezikî wê Merivan qebûl dike.

Nuhî Hecî Malê Herşid bi zimanekî ne tevlihev, bi ziamanekî hesê ku herkes dikane fêhm bike, nivisîye. Nuh xwandevanên xwe naêşîne, nawestîne û nake bin barên giran. Wanan bi zimanekî ku diherike ji serî da heta dawîyê, di hundirê kîtêbe da nerm û nerm digerîne. Nuh xwe teslime feqê şorên giranîyê neke. Zimanê kîtêbê bi giranî, zimanê herêmî ye. Lê Nuhê kurmancîyê herêmî û yê stan-



www.arsivakurdi.org




dart wek gulîyên keçên kezî bi hunêr buniyê.

Nuhî Hecê bi heqata jîyana Ehmed dixwaze pir tiştan bibêje lê, ew wan fikran di hundirî jîyanê Ehmed Elê da dixwazê xwendivan bi serê xwe bibîne.

Nuhî Hecê, genreki edebî li ba kurdan aktuel dike. Ew jî nuxazîyê û pêşvexwazîyek e. Ez dibêjim ku Nuhî Hecê him ji alîyê zimên de him jî ji alîyê navarokê da gehêştîye miradê xwe û bi ser ketîye. Nuh, her peyvekê mina rengên xaliyêkî bi cîh û war kirîye.

Eger Nuhê, beşê dudîya ku behse komala Komkar dike, kin bibirîya bi ya min hîn xweşiktir dibû.

Nuhî Hecê, heqata Jîyane Ehmed baş dagirtîye û zanatîya merîya ji bo koçberîyê dewlement dibe. Însan, carak din dibe şahîdê jîyana kurdekî ku jîyana kurdan wek wêneki ronî dide ber çavan.

Min bi xwe kîtêb xwand û têwsîyê dikim.

Destxweş bî, kekê Nuh!

www.arsivakurdi.org



Qirkirina xelkê Dêrsîmî -1938

www.arsivakurd.org